



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî

Miqdad Mîhed Bedirxan

Armanac

Hejmar, No: 139
Gulan-Hezîran
May - june 1993
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Li Kurdistanana Bakur Gaveke Dîrokî

Li Kurdistanana Bakur gaveke nuh hat avêtin. Hemû hêz û partiyên Kurdistanana Bakur ji bo cepheyê neteweyî civîna xwe ya yekem çêkirin. Di civînê de komîsyonên destûr û programê hatin damazirandin.

Piştî civîna yekem, ji raya giştî re daxwaniyek hat belavkirin.

Em li jêr vê daxwaniyê ji bo xwendevanên xwe çap dikin.

Civîna dîrokî ya rêxistinên Kurdistanana Bakur di 18-20'ê Hezîrana 1993'an de pêkhat. Ji bo damezrandina enîyêke netewî gaveke dîrokî hat avêtin û rûpeleke nû vebû. Rêxistinên me ji bo damezrandina enîyêke netewî, di vî kar û barî de berjewendiya rêxistinî danîn alîkî, berjewendiya netewî bingeh girtin.

Rêxistinên netewî, bi berpirsiyariyêke dîrokî hereket kirin û li ser damezrandina enîyêke netewî gihastin netîcayekê. Ji bo vê jî dest bi kar û xebatê kirin, di nav xwe da kar beş kirin.

Temînata têkoşîn û serketina me enîyêke netewî ye. Em di wê bîr û baweriyê de ne, ku di demeke kurt de kar û barê damezrandina enîyê bi dawî binin û wê ji bîr û raya giştî a cihanê re, herweha ji gelê xwe re îlan bikin.

Bi vê wesilê em careke din didin îlan kirin ku divê dewleta Tirk, dev ji êrîşên xwe yên bê qayde û bê rêbaz, ku li hember gelê Kurd didomîne, berde. Bi şeweyêke aşîti û siyasî, ji bo

çareserkirina vê meselê, gavan bavêje. Daxwaziya me ev e ku, hemû hêz û dezgehên aşîxwaz ên cihanê li ser Tirkiyê zixta xwe deynin, ku Tirkiyê şerê qirkirinê li Kurdistanê li hember gelê me dajo rawestîne. Her weha ji wan daxwaz dikin, ku ji bo rawestandina şer bi du alî, gavan bavêjin.

Ger dewleta Tirk vê polîtîkaya xwe ya qirkirinê û înkarkirinê bidomîne û bersiva daxwaza me nede, ji berxwedanê pê ve ji bo me tiştêk namîne. Her wiha dewleta Tirk dev ji êrîşên xwe bernede, berxwedana gelê me dê berfirehtir bibe û li seranserî Kurdistanê belav bibe.

Bê şik berpirsiyariya xwîna ku heya roja îro hatiye rijandin û ji vir pê ve jî ya bê rijandin, dewleta Tirk e. Ew li hember daxwaza azadiya me, mirinê datîne pêşiya me.

Em van bîr û baweriyên xwe pêşkêşî raya giştî ya neteweyî û gelê xwe dikin

20 Hezîran 1993

HEVGIRTIN-PDK, KAWA, KKP, PÎK, PKK, PRK(RIZGARÎ), PRNK, PSK, RNK(KUK), TSK, YEKBÛN

Dewletê rê li ber teqerawestandîne girt Dîsa şer dest pê kir

◆ **PKK:** Şerrawestandina yekalî îro xelas dibe, ev yek dixwaze bila ji alî terefek an herdû terefan be, rawestandina şer hukmê xwe wenda kiriye û di şûna wê de şerekî dijwar dest pê kiriye.

◆ **YEKBÛN:** Dewleta Tirk çiqas bixwaze bûyera Çewligê bike sebeb û êrîşa xwe ya li ser gelê Kurd bi heq derxîne jî ev tişt rastiye nagehurîne. Rastî ew e ku herçî bûyera Çewligê li gor wext û wek metod bûyereke ne di cî de be jî û çênebûya jî wê dewletê operasyon bidomandana.

◆ **PSK:** Di bûyera Çewligê de xeta û qusûrên PKK'ê çî dibe bila bibe, dewleta Tirk tu carî aşî nexwestiye, riya aşî û diyalogê girtiye.

◆ **Hevgirtin PDK:** Dewleta Tirk bi kirinên xwe bû asteng ku mesela Kurd bi riyên aşî çareser nebe. Polîtîkaya dewletê ya şiddetê bû sebeb ku li ser riya Elezîz-Çewligê 33 leşker û hinek kesên sivil bîn kuştin û birîndar kirin.



Leşkerên Tirk gund û çiyar bombebaran dikin


Di 25'ê Gulanê de gerillayên PKK'ê li ser riya Elezîz-Çewligê 33 leşker û du kesên sivil kuştin. Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan di beyana xwe ya BBC'ê de bûyera Çewligê qebûl kir û got, " me heqê xwe yê mîsîl-lemeyê bi kar aniyê." Li ser vê bûyerê ordiya Tirk di bin komandariya Necatî Ozgen de êrîşên mezin birin ser

gerillayên PKK'ê. Operasyon bi giranî li herêmên Palo, Gênc, Solxan, Lîcê dijwar bûn û li herêmên din jî belav bûn. Ordiya Tirk di operasyonan de li gel tank û top û balafirên F4 û F104, helikopterên Cobra û super Cobra jî bi kar tîne. Li gor agahdariyan di vê meha dawî de nêzî 400 kes di van operasyonan de hatin

kuştin. Dewleta Tirk êrîşên xwe birin ser Bakurê Kurdistanê jî. Şerekî dijwar di navbera gerillayên PKK'ê û ordiya Tirkiyê de rû dide.

Serokê PKK'ê Abdullah Ocalan di 8'ê Hezîranê de li Libnanê civîneke çapemeniyê çêkir.

Dûmahîk: r. 11



Serokê Weqfa Maf û Azadiyên Kurd Şerafettîn Elçî:


"DEP kopiya Hep'ê ye"

Rûpel: 5

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya:

"Em dixwazin DEP teşkilatên hemû partiyên Kurdan hambêz û temsîl bike"

Rûpel: 3





Li Tirkîyê rewşeke siyasî ya nezela

Teqerawestandina PKK'ê ya yekalî dirêj nekişand, bi bûyera Çewligê (Bîngolê) careka din toz û dûmana şerekî piralî yê bê ser û ber li Kurdîstanê serî hilda. Helbet berpirsyarê esasî yê destpêkirina vî şerê nuha hukûmeta Tirk bixwe ye. Piştî beyana teqerawestandina yekalî, hukûmeta Tirk, bi tu awayekî ciddî û dilxwazê çareserkirina gîrûguriftên nav welêt ber bi meselan neçû û îşareta çareserkirina meselan neda. Hukûmetê ji aliyê xwe de şer jî rane-stand. Dewra teqerawestandina yekalî baş diyar kir ku Tirk bi berpirsyarên xwe yên siyasî û leşkerî ve ne ku tenê ne amadeyê çareserkirina pîrsa Kurdî ne, her weha ne dilxwaz û aligirin jî. Diyar bû ku ew tenê di çarçewa rawestandî û pûçkirina şerê çekdarî de li vî meselê hûr dibin. Li gorî wan, şer raweste, rêxistin pûç bibin, herkes bêdeng û his li mala xwe rûnê, mana xwe ev mesele çareser bûye.

Di vî meselê de piçekî Turgut Ozal, bi awakî cuda şel diyar dikir. Helbet pêşniyarên çareserkirineke esasî ji devê wî demedike-

Tevgera Kurdî careka din hê ku zêde di şaşitiyan de kûr neçûye divê muhasebeyek ciddî bike, rewşa siyasî ya Tirkîyê ji bo xwe baş zelal bike û taktîkên rêveçûna xwe li gorî wê diyar bike. Firset û îmkân li ber tevgerê heye ku rê li ber bahanên Tirkîyê bigre û xwe bike aliyê xurt û rast û xwedî mafê meselê. Divê em vî firsendê ji dest nêrin.

tin, lê xuya bû ku xetereke mezin jî nedidit di çareserkirina meselê de bi awayekî nîsbî be jî ji Kurdan û maf û azadiyên wan ne ditirsiya. Tiştên ku wî pêşniyar dikirin her çend ne qîmetbilind bûn jî têra hejandina mejiyê zingarî yê berpirsyarên Tirkan dikirin bi mirina wî re di dewleta Tirkîyê de kes nema ku van mejiyên zingarî bihejîne, çerxa dewletê ber bi nêrîneka nerm a li ser vî meselê bilivîne. Turgut Ozal, li gorî dema me ya îroyîn ne hewqes merivekî pêşketî yê nûjen û hemdemî bû, lê ji ber ku çerxa dewleta Tirk li hemberî meselên dema me ya modern a îroyîn hewqas li paş û cangiran û mêjîriziyayî ye, ferqeka mezin diket navbera wî û berpirsyarên mayin ên Tirkan, ew ji wan bi deh salan pêşdetir dixuya.

Bi mirina T. Ozal re ne ku tenê kesekî wiha ji nav çerxa dewletê wenda bû, wek ji hevketina xelekên zincîrê, gelek valayî û bêistîqrarî jî di dezgehên dewletê de pêk hatin. Demirel ket şûna wî, wî jî du cîh li pey xwe vala hiştin. Bêhukmetî û piştre jî hukûmetek bê hukum li Tirkîyê ava dibe. Partiyên siyasî yên Tirkan, DYP û bi çûna Erdal İnuu re SHP hem direksiyona meşandina kar û bar ji dest xwe berdidin, hem jî bala xwe didin proplemên nav xwe. Partî bi kongra mijûl in, piştre jî salekê du salan wê bi hilbijartina mujûl bibin. Bi kurtî valahiyek siyasî ya mezin bi kêmasî ji bo van yek du salên pêşiyê li ber Tirkîyê peyda bûne. Nezela, ne eşkereyî û karnekirin, çareserkirina meselan wê bibê kareterekî esasî yê rewşa siyasî ya Tirkîyê. Ev ji bo çareserkirina pîrsa Kurdî jî dewreke nediyar û nezela peyda dike. Çaxa mejiyê dijîminê meriv ne zelal be û nizanibe wê çî bike, meriv nikare meselan pêre çareser bike, an pêşde bixe.


Di demek weha de, dawîlanîna teqerawestandîna bi bûyera Bîngolê, ji alî tevgera Kurdî ve bûye taktîkêkî şaş, ku rê li ber hin îdia û bahanan vekirîye. Tirkan ev bûyer kirine bahane û dest bi operasyonên xwe yên eskerî kirine. Di destekî wan de wê qanûna efuyê û bahana kuştina kesên neçekdar ên li Bîngolê, di desekêkî wan de jî şûrekî xwînêrêj, bi hêsanî operasyonan dikin, xwînê dirêjin. Serdestbûna rîya şer li ser rîya aşî û siyasî jî wê yekê vedîşere ku Tirk ji çareserkirineke siyasî re ne amadene, bêzelalî û bêistîqrarî di mejiyê dewleta Tirkan de heye. Heger bûyera Bîngolê nebûya, helbet Tirkan nikaribûn weha bi hêsanî xwe ji mesela siyasî bidûrxin û seriyar bibirin.

Tevgera Kurdî careka din hê ku zêde di şaşitiyan de kûr neçûye divê muhasebeyek ciddî bike, rewşa siyasî ya Tirkîyê ji bo xwe baş zelal bike û taktîkên rêveçûna xwe li gorî wê diyar bike. Firset û îmkân li ber tevgerê heye ku rê li ber bahanên Tirkîyê bigre û xwe bike aliyê xurt û rast û xwedî mafê meselê. Divê em vî firsendê ji dest nêrin.

Redaktorê berpirsyar: M. Elî
Berpîrsiyarê beşê Dimilki: Malmîsanij

Li Bonê, li Londonê û li Stokholmê bi hezaran Kurd bang kirin "Gelê me Aştî û Mafên xwe yên Netewî û Demokratîk dixwaze"

◆ Hêzên Kurdîstana Bakur bi hev re di bin sloganên "Ji bo Kurdîstaneke azad û yekîtiya netewî em hêzên xwe xurt bikin" û "Gelê Kurd Aştî û Mafên xwe yên Netewî û Demokratîk dixwaze" mitîng û meş çêkirin



Bîstek ji meşa Stokholmê (Foto: Armanç)

Di bin sloganên "Ji bo Kurdîstaneke azad û Yekîtiya Netewî em hêzên xwe xurt bikin" û "Gelê Kurd Aştî û Mafên xwe yên Netewî û Demokratîk Dixwaze" hêz û rêxistinên Kurdîstana Bakur; PKK, YEKBÛN, PSK, Hêvgerîtin-PDK, RNK(KUK), TSK, PRK (Rizgari) û KAWA li Bonê, li Londonê û li Stokholmê meş û mitîng çêkirin.

Li Bonnê nêzî sed hezar kesî li London û Stokholmê jî nêzî 1500 kesî beşdarî meş û mitîngan bûn. Partî û rêxistin bi bandrolên xwe meşiyar.

Di meş û mitîngên Stokholmê de li ser mana mitîngê bi Swêdî YEKBÛN'ê, bi Kurdî PSK'ê û bi Tirkî jî PKK'ê axaftin kirin. Ev cara pêşîn bû ku li Swêdê di meş û mitîngêke Kurdan de bi zim-anê Tirkî axaftin dihat kirin.

Di meş û mitîngan de PKK'ê biryarên ku ji aliyê Komîta Hevbeş yên Meş û Mitîngan ve hatibûn standin, îhlal kirin. Ev îhlalkirin di meş û mitîngên Stokholmê de jî çêbûn.

Biryarên Komîteya Amade-

kirina Meş û Mitîngên li Stokholmê ku PKK'ê jî qebûl kiribûn, ev bûn;

1- Ala Kurdî di meşê de wê herî li pêş be.

2- Piştî ala Kurdî, bandrola bîngehîn "Ji bo Kurdîstaneke Azad û Yekîtiya Netewî em hêzên xwe xurt bikin" wê bihata vekirin û di bin vî bandrolê de jî rêxistinên ku bandrolên xwe venekin û kesên serbixwe wê bimeşin. Piştî wê jî rêxistin ku li gorî belavokê hatibû nivîsandin, wê bimeşiyana.

3- Ji derveyî sloganên ku hatibûn tespît kirin, sloganên din wê neyên avêtin. Mesajên ku ji mitîngê re hatibûn şandin wê bihatana xwendin.

Lê di dema mitîngê de PKK'ê îtiraz kir û got ku divê ala Kurdî ne li peşiya meşê be, anca rêxistinên ku dixwazin, dikarin bi korteja xwe re vî alê vekin. Li ser îtiraza Komîte, aleke piçûk qebûl kir ku li herî pêş vebe.

Di wexta meşê de problemeke din derket. PKK'ê nehişt rêxistinên ku bandrola xwe venekiribûn û kesên serbixwe di bin bandrola hevbeş de li pêş bimeşin. Li ser vî

yekê gelek kesên serbixwe û Kurdên Başûr û Rojhilat ciyê mitîngê terk kirin.

Ji bilî sloganên giştî, PKK'ê sloganên xwe avêtin û li Ser-gelstorgê (ciyê civînê) mitîng kirin mitîngên PKK'ê.

Ev kirinên PKK'ê di civîna Komîta Amedikerina Meş û Mitîngên Stokholmê de (ku civîn piştî meşê çêbûye) ji aliyê endamên komîte ve hatin rexnekirin û ji PKK'ê daxwaza lixwe rexnegirtinê hat kirin, lê PKK'ê ev daxwaz qebûl nekirîye û gotiyê ku "ger ku ev al hebe, ji îro pê ve di pratîkê de em nikarin bi hev re bimeşin".

Sipasi

Hevalê me yê hêja Zinarê Xamo dev ji endametiya redaksiyona Armançê ber-daye. Redaksiyona me ji ber xizmeta wî, ji dil spasiya wî dike.

Zinarê Xamo wê berdevam di quncika "Stiriyên me" de binivîsîne.

Redaksiyon

Armanç
Rojnama Kurdî ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Elî
Hesen Mizgîn
Mîrza Bextiyar
Lewend Firat
S. Rêving
M. Lewendî

Redaktorê berpirsyar:
M. Elî
Berpîrsiyarê beşê
Dimilki: Malmîsanij

Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Utges av:
Kurdiska
Demokratiska
Arbetarunionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonetî
Prenumeration
Abonetiya Salekê
Li Skandinaviya
200 SKR
Maçam
Myndigheter
400 SKR
Li Ewropa
50 DM
Li derveyî Ewropa
40 \$
Anons/ilan
niv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya:

"Em dixwazin DEP teşkîlatên hemû partiyên Kurdan hêmbêz û temsîl bike"

Dûrketina ji siyasetê

Tu yek ji kesên "dawa 49'an î". Ji wan 49 kesan (yên li jiyane ne) hejmareke pîr hindik, heta îro bi aktîvî bi siyasetê mijûl dibin. Piştî kovara Dengê, tu bi xwe jî demeke dirêj bêdeng mayî. Lê di van çend salên dawiyê de navê Yaşar Kaya bi xurtî derket rojevê û cihê xwe careke din di nav siyaseta aktîv de girt. Gelo sebaba demeke dirêj bêdengmayîna te çi bû? Li ser vê pîrsa me; Yaşar Kaya wiha bersiv da.

"Ji 1965'an heta 1980'î Kurdan li Kurdistanê Bakur gelek partiyên siyasî çêkirin. Ez tev wana nebûm. Li gor min ji dervayî PKK'ê partiyên din gelek zerar dîtî. Gelek ji van partiyên ketine destên polîsan û ketin zindanan. Ev ji bo min faktoreke gelek mezin bû. Min li derdorê xwe didî ku kadroyên bi tecrube yê Kurdan tunene. Ya duyem, min hez dikir ku ez nîşanî Kurdan bidim ku li Kurdistanê mirovekî bi tenê jî dikare li ser piyan bisekine. Ev tewreke demokratîk e. Mirovek li Kurdistanê dikare her demê jî bo Kurd û Kurdistanê bijî. Dikare pirtûkan binivîsîne, rojnemeyan, kovaran derxe. Alîkariya Enstîtuyê bike. Ev gelek muhîm in, Kurdan mîna dîn, îman, mezhep partî parêzî kirin. Min hez kir ku di nav me de hinek mirov derkevin ku helwesteke demokrat bigrin. Mesela ji PKK'ê re bibêjin eva çewt e, ji Rêya Azadî re bibên veyra çewt e ûh.w, vêya binivîsîne. Ha wê bikujin! Bila bikujin, xem nîne. Divê em demokrasîya di nav Kurdan de pêşde bibin. Van herdu faktorên de gelekî mijûl kirim. Xema ez di nava vê demê de durrî siyaseta û partiyên Kurdan mam. Lê xebata min kêr nebû. Kîjan partiyê bo Kurdistanê xebat kir min dîsan alîkariya hevalan kir."

Ferqa DEP û HEP'ê

Bêjî nebêjî axaftina me çû ser avakirina DEP'ê. Li gor serokê DEP'ê ferqa DEP'ê û HEP'ê wiha bû, Armanca DEP'ê, di platformên demokratîk de dengê gelê Kurd bilind bike. Di parlamentoyê de bixebite cihê vala nehêle û ji bo gelê Kurd xebatê bike. Ji bo wê jî tecrûbeyên HEP'ê jî derbasî jiyane bike. Di dema HEP'ê de gelek tengasî çêbûn. Gelek heval, partî û siyaseten Kurdan nehatin HEP'ê. Lê belê nuha em dinîhêrin ku ji bo Yekîtiya Kurdan partiyên li derve hatine cem hev. Gelê me bi vêya pîrê kêfxweş bû. Gel dibêje ku hûn nebin yek em tu alîkariyê nadin we. Gelê Kurd alîkariyê dide me. Siyasetên Kurdan û Kurdên bê siyaseta jî tene DEP'ê. Ez bawer dikim, ku ew çewtî û tengasiya ku di HEP'ê de ji bo DEP'ê ne mumkun e.

Dema ku HEP hate damezrandin me hemuyan hevî dikir ku HEP wê bibe dengê Kurdan. HEP nebû dengê Kurdan. HEP teng bû. Gelek siyaseten Kurdan di kongreya paşîn de ji HEP'ê veqetîyan. HEP'ê bi vî awayî qeweta, xwe wenda kir. Lê rewşa DEP'ê ne weha ye. Di destpêkê de hemû



Yaşar Kaya: Di dema HEP'ê de gelek tengasî çêbûn. Gelek heval partî û siyaseten Kurdan nehatin HEP'ê. Lê belê nuha em dinîhêrin ku ji bo yekîtiya Kurdan partiyên li derve hatine cem hev. (Foto: Armanç)

siyasetên Kurdan û gelê me milên xwe dane DEP'ê. Dixwazin DEP'ê jî bo xwe bikin partiyeke yekîtiyê. Loma em dibêjin DEP ne weke HEP'ê ye. Yekîtiya di DEP'ê de, di HEP'ê de tunebû.

Belê di vê kongreya dawî de, siya hêzekê kete ser HEP'ê. HEP teng bû. Partî û siyaseten din jî HEP'ê veqetîyan û loma HEP teng ma, û nuha ew nema ye. Nuha li derve çiqas siyaseten Kurdan hene yekîtiyek çêkirin. Li hundur jî ev yekîtiyê li ser DEP'ê ye. Loma em dibêjin DEP teng nebe. Siya siyaseten derva ye nekeve ser DEP'ê.

Siya Partiyên Îlegal

Me Kurdan hemûyan dît ku siya partiyeke têkeve ser partiya me ya legal xêra wê namîne. Gelek heval jê vediqetin û ji quweta me gelek tişt kêr dibin. Ev tecrûbe êdî nahêle Kurd weha bimeşin. Yek ew e. Ya duduya jî, dema ku em him li Kurdistanê û him li wilayetên metropolê teşkîlata partiye çêdikin, em hez nakin û nahêlin jî ji partiyeke û ji siyasetekê piranî hebe. Kurdên bê siyaseta jî bê teref jî di partiye de cihê xwe bigrin. Em dixwazin eşkîlata partiye Kurdan gişan hêmbêz û temsîl bike. Li gor min, ger em van herdu garantiyan ji destên xwe dernexin, ji bo me baş e.

Heta nuha (heta 28.05.1993-an) li 33 wilayetên teşkîlata partiye hatiye çêkirin.

Helwesta Ş. Elçî li hember DEP'ê

Yaşar Kaya bersiva pîrsa me ya ku di destpêka avakirina DEP'ê de hinek kesên ku bi vê xebatê re bûn, veqetîyan. Wek Şerafettin Elçî û hevalên wî... Gelo sebaba vêya çibû. Û we di tesbîtkirina nûneran de çi pîvan bi karanî? jî wiha dida:

Mesela HEP'ê di "Dadgeha Qanûna Bingehîn" de ye. Bê partî mayîna me jî dê bibe sebebê ku em dê nikaribin li platformên demokratîk û parlamentoyê xwe temsîl bikin. Ji bo vê yekê jî di vîyabû me partiyeke legal damezranda. Hevalên HEP'ê jî ji me re bûm alîkar. Li Ankarayê civînek çêbû. Ji 20 mirovan komîsyonek hate hilbijartin û Şerafettin Elçî jî serokê vê komîsyonê bû. Komîsyonê destûr û program partiye çêkir. Heta hilbijartina serokatiya partiye, Şerafettin Elçî bi me re bû. Roja hilbijartina ji bo serokatiya partiye ji 55 endamên damezranêr 45-46 kes li wir bûn. Şerafettin Elçî got: "Ez dixwazim heval giş li ser min îtifaq bikin, min bikin serok. Vê garantiye bidin min. Ez dê bibim "aday". Wekî din nabim "aday". Ez jî "aday" bûm, Ibarhîm Aksoy jî "aday" bû. Lê Şerafettin rabû çû. Piştî hilbijartin çêbû ez bûm serok. Me Ibrahîm Aksoy jî bi yekdeng kir Sekreterê Giştî. Şerafettin hevalê me ye, birayê me ye. Li gor min wî neheqî hem li xwe û hem jî li hevalan kir. Li gor min demokrasî heye. 10 heval jî dikarin bibin "aday" Damezranên partiye kê hilbijêrin, ew dibê serok û yê din jî pê re dixebitin. "Ez hebim ez dixebitim, ez tunebim ez li vê derê naxebitim" Li gor min vêya zihniyeteke çewt e. Ev îro nobetek e. Li pêşîya me kongre heye. Gelek heval dikarin bibin "aday" û ev rê jî bo herkesî vekirî ye.

Ez nizanim çi pîvan hatibû bikaranî lê îtiraza Şerafettin ji wan 55 kesan jî yekî jî tune bû. Wî bi xwe ew hilbijartine, ger ez nebûma "aday", ger Ibrahîm Aksoy nebûya aday hevalan wê ew bikira serok ew dê bi wan hevalan hemûyan re bixebitiya, ez dê vê rast raste jî wî re jî bibijim, ev çewtiyeke mezin e. Ger hevalan bigota serok tu yî, ma wê ev

NEYNIK

Dîrokê îspat kiriye ku bêyî alîkariya dostan, tu netewe nikarin xwe azad bikin

S. DEMIR

Di hejmara Armançê ya 138-an de, di rûpelê duwemîn de û di quncîka "Rojeva Mehê" de, nivîsek bi navê "Li ber dergehê qonaxê nû" derket.

Di serê nivîsê de gelek peyvên rast ku belengazî tanîn bîra mirov hebûn. Wek derengmayîn, xwe muhasebekirin, perspektîv, stratejî û hwd. Lê ku mirov bi nav nivîsê de diçe, tê xuya kirin ku pîrê şaşî tevî hinek rastîyan bûne, ku alaqa wana bi rojeva mehê qet tune. Di nivîsê de, hemû tiştên rast, ji bo alîkariya tiştên şaş hatine nivîsandin.

Rojeva Kurdan îro ne qebulkirin an jî redkirina aborîya dewletî ye. Lê nivîs vêya dike sedema bingehîn ya biserneketa Kurdan û riya ji bo ku Kurd heta îro bi serneketa tîne di vir de asê dike.

Li gor nivîskarê "rojevê" qonaxa ku Kurd hatinê, ew qonaxa ku biryara xwe bidin bê aborîyeke milîkirî dixwazin, yan na. Û nivîs li ser pêşniyarekê di vê derheqê de hatîye ava kirin: Pêwîst e ku Kurd sûka kapîtalîst ava bikin. Yanî çawa? Roja Kurdistan azad bû, pêwîst e em petrol, febrîqê û erdê Kurdan bidin çend zikmezînan û xelkê ku hatine kuştin û talan kirin, ta b'û sêfilî dîtine jî ji wan re bixebitin.

Gelo ev ecele ji ku tê. Nivîskar wilo dibêje: "Gelo heta niha li Sûriyê, li Iraqê, li Îranê û li Tirkîyê, siyaseta aborî ya milîkirîne û dewletkirîne, petrol, erd û febrîqên ku li Kurdistanê ketin bin destê dewletên Îran, Sûriyê û Tirkîyê çi ji bo Kurdan anî, talan û bê sermîyanî, çolbûn anî yan refah û dewlemendî?". Dîyar e, ecele ji vir tê. Ew dewlemendî, ew milk û milak ji Kurdan hatine standin û ew ne ji bo "refah" a Kurdan hatine milîkirin. Millîkirina wan dewlemendiyan jî, ji bo kirîna çekên ku li hember Kurdan tene bikaranî, îmkaneke baş xistiye destên dewletên dagirker.

Li gor nivîskarê nivîsê, ji ber ku Kurdan digot; em sosyalîst û antî-emperyalîst in û ku ne gotibûn em aborîyeke milîkirî naxwazin, her tiştên ku kirine heta îro tu berhem nedaye. Ji bo ku Kurd do sosyalîst bûn, şablontî kirine û ji ber vê yekê jî nikaribûn bibin yek.

Ew tiştên ku jê re tê gotin "şablone amadekirî" bûn, do xurt bû û li gor nivîsê, nivîskarê me jî pê re bû. Lê ji ber ku îro qels e, şîreta ku mirov divê tu nîşanên wê li ser xwe nehêle dike. "... Li pey hilbûna bayê rojane, geh bi vir de û geh jî bi wir de likumîn..." jî bê guman ev e.

Dema guhertin di siyaseta tevayî de dibin, kesên ku tê ne gihîştibûn bê çi dikin, şaş dibin, ji serkê vî alî xwe diqevêzin serkî din. Doya xwe tevî red dikin. Heke do sosyalîzm diparastin, îro ne di navê de ne jî, dibin dijî wê. Heke do yekî mîna nivîskarê rojevê her tişt şaş kiribe, îro şensa famkirina rastîyan ku hene, ne pîr e.

Kurdan di hêla stratejîk de, do rast dikirin. Dinya du beş bû. Bloka Sosyalîst li ser piya bû. Dîrokê îspat kiriye ku bêyî alîkariya dostan, tu netewe nikarin xwe azad bikin. Dostên stratejîk û dîrokî sosyalîst bûn û îro jî ew in. Miletên di rewşa me de ku di wê demê de azad bûne, tev bi alîkariya welatên sosyalîst azad bûne. Tê nivîsandin ku pêwîst e, em wek Vietnam, Mozambîk û Angola nekin. Baş e, ji van welatên ku bi çek, pispor, pere û alîkariya sosyalîstan, (ku me jî weke wan dikir) azad bûne pê de kî din wê demê azad bû? Li gor ku di rojevê de, qala lêkolîn û analîza jî tê kirin, dîyar e ku ev rastî nehatine dîtin.

Em bikin nekin, îro weke wana do kirin, nabe. Lewra îro sistemeke sosyalîst tune. Stratejiyeke cuda pêwîst e. Lê navê wê, ne ew pêşniyara ku mirov di rojevê de dixwîne ye.

Li gor ez dizanim siyaseta Armançê ya bingehîn ne ev e.

Ez wek xwendevan û dostekî dilsoz yê Armançê, ne li hember ramanên cuda, û ne jî li hember çapkirina nivîseke wilo me. Lê nivîsên wilo ku Armançê binbar bikin, bê nav û di rojeva mehê de bîn nivîsîn, dê ji Armançê re bibin mal û dê mirov bê hevî bikin. Min dixwest ku ez di Armançê de, nivîseke wilo bi navê nivîskarekî, di rûpelekî din de bixwînim.

civîn fesih bikira? Na, wê bi wan 55 hevalan re bixetîya û dê organên din yê partiye çêbikira. Na. Mesela dikarîbû ji bo hevalekî bigota bila ev nebe endamê partiye, ev xayîn e, ev tîkiliya wî bi nêyar re heye" Lê na ew jî dizane ku hevalên me welatparêz in, hemû xebatkar in, hemûyan jî bo mesela Kurdistanê gelek îmtîhan dane. Hevalan ew hilbijarta dê bê întîraz bi wan organên

din yê paratiye re bixebitiya. Lê ew bi xwe nebûye serok îcar dibêje mejiyê van hevalan teng e." Lê te ev heval hilbijartine, bersiva herkesî ji ew e. Hevalan komîsyon teslîmî te kir û te kirin serokê komîsyonê, destûr te çêkiriye. Li gor min çewtiya wî di wê derê de ye."

RAMANÊN RAMANWERAN

Bi şablona li hember şablona têkoşîn nabe

Reşit Burhan

Di hijmara ARMANC'ê, a Nisana 1993 de, di quncika "Rojeva Mehê" de meqalek bi navê "Li ber dergehê qonaxek nuh" hat weşandin. Li gor lênerîna min, nakokî, tesbîten ne di cih de û optîmîstiya zêde, di wê meqalê de hene. Ez ê li ser wan çewtî û nakokîya ranewestim. Bêtir pirsên bi aboriyê ve girêdayî ne, wê bi-bin babeta meqala min.

1) Dewleta ku em lê dijîn, di qonaxa civaka kapîtalîst da ye ku nakokîyên wê bêtir tazî ne û berbiçav in. Sîstema wê ya kapîtalîst a ku bi mer-hela wê û karakterê wê ve girêdayîye, barbar e. Vê sîstemê problemên civakê û aboriyê çareser nekirin, lê bêtir giran kirin. Li Tirkiyê mulkiyeta ferdî (MF) û Siyaseta aborî a bazara serbest(SABS) serdest e, li hemberî wê, me jî mulkiyeta dewletê (MD) û siyaseta aborî a pilankirî ya dewletê(SAPM) wek çarê îdeal didît.

2) Nezaniya me ya di derheqê zanistaya aborî de pir zêde bû.

3) Em di bin tesîra propogandêke îdeolojîk de bûn.

4) SAPM û MD mode bûn.

Ev nexweşiya populârîzmê û şablona SABS'ê û MF'yê di meqala Armançê de jî di bin pirsê de diyar dîke:

1) "... di siyaseta aborî de behsa aboriyek milîkirî yan dewletkirî bikin, yan divê em siyasetek aborî ya din derxin pêşiya xwe." Navê wê "siyaseta aborî ya din" çî ye?

Nav lê nehatiye kirin. Tevî wê yekê jî xwendevan karin bi rehetî têbigihên ku li gor nivîskarê meqalê, du şiklên siyaseta aborî hene. Yek ya me berê "behs" dikir, ya din jî ya îro populêr e li dinyayê. Ku ya doh, me behs dikir şablona bû, bê guman nivîskar ya îro diparêze. Lê çima nav lê ne kiriye? Emê di kîjan demê de "siyaseta aborî ya din" têxin pêşiya xwe? Di qonaxa rizgariya Kurdistanê de, yan jî piştî rizgariyê piştî demekê emê wê têxin pêşiya xwe? Bersivên van pirsan di meqalê de tunene. Lê bersivên van pirsan rast bi rast bi siyaseta aborî ve girêdayî ne. Li gorî qonax û gihaştina aboriya welatekî, siyaseta aborî tabîq dibe. Şiklê xwedaniya milkiyetê jî li gorî demê û aboriya welatan tîng guherandin, ne herdemî ne. Reçetên aborî ên ji bo her demê û her derê tunene. Lê SABS û parastina MF'ê reçetak weha ye, ji bo her demê û her wela-tî ye!

2) "Gelo heta nuha li Sûriyê, li Îranê û li Tirkiyê siyaseta aborî ya milîkirî û dewletkirinê petrol, erd û febrîkên li Kurdistanê ketin bindestê dewletên Îran, Iraq, Suriye û Tirkiye çî ji bo Kurda anî, talan û bê semiyânî, çolbûn anî, yan refah û dewlemendî?" dibêje nivîskar.

a) Dewleta Îranê, Iraqê, Suriyê û Tirkiyê li Kurdistanê erd millî û

dewletkirin nekiriye. (Çend çiftlik ne tê de). Erd yê ferdan in. Mînak, li Kurdistanê Suriye erd ji Kurdan stendine û dane Ereban. Erdê di destê Ereban de, ne ye dewletê ye, ye şexsan e. Lê ji bo Kurda bû perîşantî. Erdên li Kurdistanê Bakur pîrên wan di destên çend kesên berê feodal bûn de ye. Bi vî şiklê xwe erdê refah ji Kurda re neaniye. Siyaseta aborî ya kolonyalîstiyê li seranserê Kurdistanê heye û struktura aborî a wan daniye, feqîrî û birçîbûn ji gelê me re aniye.

b) Van dewletan fabrike bi destên xwe ava kirin. Fabriqên berê li Kurdistanê yê ferdan bûn,

ên Sabancî jî bin û ên Shell jî bin, wê ji bo Kurdan tişteki ne-guherîne. Kî xwedî be bila xwedî be xêr û bereketa wê ne ji bo Kurdan e, Kurd ne xwediyê welatê xwe ne, ne jî xwediyê dewlemendiya welatê xwe ên li ser erd û bin erd in. Biyanî xwediyê dewlemendiya me ne, xêr û bereket jî ew bixwin.

Ku sedemên feqîrî, birçîbûn, talanbûn û xizanbûna me xwedaniya dewletê bûya ma ji bo çî me yê serê xwe wiha bêşanda, çawa be wa ye Tirkiye SABS tedbîq dîke dewletê di aboriyê de biçûk dîke û MF zêde dibe, emê jî hêdî hêdî xelasbûna, problema me wê çareser bûba.

3) Gelo siyaseteke aborî ya dewletê û milîkirî pirtir riya tekilî û çûnûhatin û jiyaneke pîr alî di navbera Kurdên her çar parçan de vedike, yan siyaseteke serbest a milkiyeta xusûsî bi ber sîstema bazara Ewropa de.

a) Ên riyên tîkiliyan û çûnûhatina Kurdên herçar beşa birine ne MD ye û ne MF ye. Dewletên Kolonyalîst bi riyên eskerî û siyasetî tîkiliyên Kurdan birine. Heta ev siyaset jî holê ranebe, her wê tîkiliyên Kurda wiha bin. Kurd jî bo ku Kurdan bibîne pasportê divê, çî tîkiliyên pasportê û şiklê xwedaniyê bi hev re hene?

b) Na ku qesta nivîskar piştî ev siyaseta kolonyalîstî ji holê rabe wê SABS tabîq bike û tîkiliyên Kurda wê zêde bibe, wê demê a baş Kurd bibin yek, ma ne wisa ye? Ne ku berî xelasiya Kurdan be, ne SABS û ne jî MD wê tîkiliyên navbera Kurdan karibe xurtîr bike. Têl û mayînen di navbera Kurdan de ne berî MF ye ne jî ê MD ye, sebeb kolonyalîstiyê ye. Gelo gava ez behsa kolonyalîstiyê dikim, dibim şablona?

Di dema Şah de MF li ser ale-tên berhemê bû, aboriya wan ya serbest ber bi Emerîka de bû, lê her tîkiliyên Kurda ne pîrhêl û fireh bûn. Bi rastî tê nagihem ji bo çî nivîskarê Armançê Kurdan şaş dîke.

4) "Gelo kîjan wê rê weke ku aboriya Kurdistanê gûl vede?" Di-pirsim ji bo kîjan demê û kîjan merhela aboriya Kurdistanê? Rehmetiyê U. Mumcû Kurd bi MF tehdît dikir û dinivîsand ku dewlet li Rohhilata Anadolê (Kurdistanê) fabriqe ava nake, wê Kurd perîşan bibin. Ji bo em minetarên Tirkiyê bin, wî ev nivîsandin meqalê Kurda bi MD çavtirsandî dîke. Na ku qesta nivîskar piştî Kurdistanê xelas bibe ye, û bibêje "we kîjan rê bibe sebeb ku aboriya Kurdistanê gul veke". We dema dibê ez dipirsim kîjan xelasbûn? Hinek xelasbûnê di mafê mirovatî û mafê kulturî de dibînin. Ev "xelasbûn" tu mafî nade Kurda ji bo ku siyaseta xwe ya aborî bi cih bînin.


Hinek din jî xelasbûnê di federasyonê de dibînin. Xelasbûna federasyonê mafekî fireh û azad nade Kurda ku ew siyaseta xwe ya aborî bi cih bînin. Ew kesên fede-

dawiyê dewlet ew millî kirin, bê guman hindêk jî ên ferdan e, lê ew ne di giraniyê de ne. Hemû fabriqên li Kurdistanê hene ên Koç bin yan jî ên Sabancî bin, tişteki ji bo gelê Kurd neguherîne. Dewlet li Kurdistanê fabriqe avakirine ji bo talankirina dewlemendiya Kurda a ser û bin erd. Koç jî fabriqan li Kurdistanê ava bike wê ji bo talankirina Kurdistanê be. Sermaya Kurd li Kurdistanê fabriqa ava nake, ew jî ne ji nexwestina wan tê, ji tengbûna bazara û struktura aboriya Kurdistanê tê. Bazara fireh û kûr sermaye dikşîne hundirê xwe. Me berê feqîrbûn û ne pêşketina aboriya Kurda bi kolonyalîstiyê dizanîbû. Lê xuya dibe ew jî şablonek kevn e! Sebeba feqîrî û talanbûna dewlemendiya Kurdistanê "bê sermayeya" Kurdistanê jî siyaseta aborî a millîkirî û dewletkirî tê.

c) Bê sermaye ne tegeyek zanistî ya aboriya dema meyî em tê de dijîn. Li Kurdistanê ne "bê sermayeyî" heye, sermaye ji Kurdistanê diherike Tirkiyê, Îran, Iraq û Suriyê. Ew jî ne ji bo milîkirina fabriqa û petrola Kurdistanê tê, sedemê wê jî kolonyalîstî ye, danîna struktura aborî ya Kurdistanê ye. Ku sermaye li Kurdistanê tunebe, wê çawa biherike derve. Bê guman sedemên herikandina sermaye ji bo wan dewletên Kolonyalîst jî hêla nivîskar ne diyar e.

d) Pîr petrol li Kurdistanê derdikeve. Şirketên petrolê li Kurdistanê derdixin ên dewletan jî bin,

Hemû fabriqên li Kurdistanê hene ên Koç bin yan jî ên Sabancî bin, tişteki ji bo gelê Kurd neguherîne. Dewlet li Kurdistanê fabriqe avakirine ji bo talankirina dewlemendiya Kurda a ser û bin erd. Koç jî fabrikan li Kurdistanê ava bikin, ew jî bo talankirina Kurdistanê, ji bo sermaye Kurd li Kurdistanê fabriqa ava nake, ew jî ne ji nexwestina wan tê, ji tengbûna bazara û struktura aboriya Kurdistanê tê. Bazara fireh û kûr sermaye dikşîne hundirê xwe..



Zinarê Xamo

Daxwazeke Biçûk

Bê guman yekîti, hevkarî tişteki pîr baş e, pîr xweş e; kêfa her kesî jê re tê;helbet kêfa min jî. Ez tu çewtiyê di vê kêfxweşiya millet de nabînim. Bila çewtî li wir bimîne, wek her kesî ez jî vê hevkarîya hêzên siyasetî baş dibînim. Lê divê ev hevkarî û diyaloga ku di navbera hêzên Kurda de peyda bûye bes di çerçewa protokol û belavokan de nemîne, ji millet re havelêkê bike, tişteki bi ser avê xe. Bi gotîneke din, kar û xe-bateke konkret bike.

Bi kar û xebatê qesta min ne ewe ku hema bila sibe rabe dinyayê bi ser serê dijmin de hilweşînin û di nav çend rojan de Kurdistanê rizgar bikin. Ez bi xwe wek hinekan nuha tiştên hewqas mizîna naxwazim. Çimkî ez dizanim "kevîrê giran elametê neavîtinê ye". Lema jî di daxwazên xwe de ez ne bêînsaf, û pîr mutewazî me. Tiştên ez dixwazim tiştên pîr biçûk in, ne hewceyî şoreş û rizgarkirina Kurdistanê ye.

Gelo ev tiştên "pîr biçûk" çî ne?

Wek tê zanîn, baş xerab, îro li welêt em dikani bi Kurdî neşriyatê bikin. Lê ev îmkân îro heye sibe dikane tunebe. Tu garantiya berdehamiya vê îmkânê tune ye. Di esasê xwe de li Tirkiyê jî bo Kurda îro garantiya tu mafî, hetta garantiya jiyana wan jî tune ye; her "maf" bi benekî xav ve girêdayî ye, her-tim dikane biqete. Berî ku ev ben biqete divê em dûzanekê bidin zimanê xwe, wî tîxên qalibekî millî yanî standardîze bikin.

Baş e kî yê vî karî bigre ser milê xwe û wê çawa bi cî bîne? Bi dîtina min ev yekîti ya jî "cepha" di nava hêzên Kurda de çêbûye gava bixwaze dikane bi karekî wiha rabe; ji bo zimanê Kurdî dikane hin dezgehên millî û xwedî fonksiyon ava bike. Bibe alîkarê avakirina wan.

Helbet berî destpêkirina karekî wiha divê em gelsê baş teşxîs bikin. Yanî divê em baş bizanibin ka kul û kêmasî û problemên zimanê me çî ne? Û emê çawa û bi kîjan rîyan wan çareser bikin?

Di vî warî de bîyî ku ez gelek numûneyên dirêj li dû hev rêz kim, bi kurtî ez dikanim bibêjim ku di rastnivîsîna Kurdî de îro anarşiyek mezin heye. Hin grûb, rojname, hetta hin şexs jî ji xwe re li gora dilê xwe îmlayekê bi kar ûnin, gramereke wan a xas heye û bi "elifbeya xwe" dinivîsin. Ev yek ji bo xwendevan serêşiyek mezin û ji bo zimên jî anarşiyekê peyda dîke. Rê li ber pêşketina Kurdî digre û dibe sebebê belavbûn û bicîbûna gelek çewtiyên mezin.

Ji bo çareserkirina gelsên wiha yê xelkê dewlet heye, tezgêhên millî yê xwedî otorîte hene. Ew, hin qaîdan datînin û millet jî rîyayetî wan qaîdan dîke. Lê em Kurd îro ne xwedî dezgehên wiha ne, yê hene jî ne xwedî otorîte ne. Kes ya kesî qebûl nake, her kes xwe alim û zimanzan dibîne. Bi vî karên xwe jî ew dibin sebebên çêbûna zimanekî çêkirî û çewto mewto. Û ev yek jî xwendevan ji Kurdî sar dîke, mesafeekê dixê navbera xwendevan û Kurdî. Wer bûye ku êdî her kes li ser serê Kurdî jî xwe re fêrî berberiyê dibe.

A di vê nuxte de yekîtiya çêbûye dikane roleke pozîtîf û tarîxî bilîze. Mesela:

1-Ev yekîti di demeke kin de dikane bi riya hin kesên ziman-zan kongreyeke(kurultay) zimên bide civandin.

2-Di vê kongrê de divê ji bo herdu lehçeyên Kurdî(Zazakî, Kurmancî) elifbayek, îmlayek û gramereke millî ya tekûz bê qebûl kirin.

3-Ji bo amadekirina ansiklopedî û ferhengeke ji yê mawcûd hin mukemmeltir, divê wezîfeyê bide kesên ji heqê vî karî der-tên. Û ji bo meşandina vê xebatê jî divê ji alî maddî ve wan kesan finansê bike.

4-Dîsa divê ev kongre, komisyoneke zimên ya daimî hilbijêre û divê ev komîsyon karê xwe bi hawakî profesyonelî bidomîne.

5-Ev komîsyon divê weşaneke zimên a peryodîk derxe.

Kesên ji bona van karan bêne hilbijartin divê ne li gora tifaqên siyasetî bin, ne ji ber ku ew berdevkên hin hêzan e bêne hilbijartin, ku îro gelek numûneyên wiha hene. Divê bi rastî ew erbabê karê xwe bin. Bê şik kadirên wiha di nav Kurda de pîr in, gelekên wan îro bi jî xelkê re bi nanzikê dixebitin. Ev yek ji bo me zayiateke mezin e. Divê ev platform ji alî maddî û manewî ve piştgiriya kesên wiha bike ku ew jî zanîn û qabiliyetên xwe pêşkêşî gelê xwe bikin.

Ji ber dijayetiyên siyasetî û tunebûna diyalogê avakirina dezgehên wiha do ne mumkûn bû. Lê îro zêmîna karekî wiha heye, divê li hebmer wezîfeyêke wiha em sersariyê nekin.

Bê guman gelek xebat û wezîfeyên muhîm li pêş vê yekîtiyê ne, ez di şûra wê de me. Lê ev nuxteyên ku min li jor qala wan kirin jî ji bo jiyana milletekî pîr muhîm in. Gava zimanekî meyê yekbûyî, di her warî de dezgehên me yê millî hebîn, em her kes kanibin bi zimanê xwe, bixwînin û binivîsin, klasîkên dinyayê bi wî bixwînin wê demê em RÎZGAR bûne; eksî vê felaketa me ye.

Hewpeyvîn

Hevalên me Faris Can û Mustafa Aydogan li ser damezirandina DEP'ê û li ser Weqfa Maf û Azadiyên Kurd bi Şerafettin Elçi re peyvîn. Em vê hevpeyvîne pêşkêşî xwendevanên xwe dikin

Ger bibêjin "Em Kurd in" wezîrtî ji dest diçe

Armanç: Dema ku hûn Wezîrê Îmarê bûn we di beyanekê de gotibû ku "Li Tirkîyê Kurd hene û ez jî Kurd im" li Tirkîyê qiyamet rabû û li ser vê peyva we 15 sal derbas bûn. Îro jî du wezîrên ku Kurd in û di hukûmetê de cî digrin (Wezîrê Derve Hikmet Çetîn û Wezîrê Mafê Mirovan Mehmet Kahraman) ku ev bêjin li Tirkîyê Kurd hene û em jî Kurd in. Wê şêla dewleta Tirk çewa be? Di vî warî de siyaseta dewletê bi dîtina te hatiye guhertin?

Şerafettin Elçi: Siyaseta dewletê îro nehate guhertin. Lê dinya hatiye guhertin û fikra demokrasîyê li dinyê gelek pêşve çûye. Ev pêşdaçûna demokrasîyê û mafên însanî tesîra wan li ser Tirkîyê çêbûye. Nermî çêbûye, berî şexsekî bigotaya ez Kurd im muheqeq wê ceza bidana wî çunkî min jî ji ber vê gotinê piştî derbeya 12 îlonê 2 sal û 3 meh ceza xwar.

Lê îro M. Kahraman yan jî H. Çetîn ku cesareta wan hebe, bêjin em Kurd in, wê reaksiyona wê demê li hember min çêbû, nebe. Ez ji wan ne bawer im. Lê dîsan jî ku ew bêjin em Kurd in, bawer nakim ku wan bikin wezîr, dê wezîrtiya wan ji destê wan biçe. Lê ew reaksiyona dijwar wê li hember wan nebe, wê ceza nexwin, lê ewê kariyera xwe ya siyasî wenda bikin.

Li Tirkîyê nermbûn çêbûye. Tirkîyê hîn resmî Kurdan nas nake. Di qanûnên esasî yê Tirkîyê de dibêjin her çi kî hemwela-tiyê Tirkîyê be, ew Tirk e. Dewletê siyaseta xwe neguher-tiye. Meriv nikare bi navê Kurdî partiyên siyasî û komelan, û weqfan veke.

Armanç: Em dixwazin bîn ser "Weqfa Maf û Azadiyên Kurdan" we ev Weqf bi çi armançê ava kir û dameziranên wê kî ne û nuha jî çi fonksiyona wê di civata Kurd de heye?

Elçi: Di sala 1991'ê de birek însanên rewşenbîr li Stenbolê xwe dan hevûdu û gotin: lazim e em li ser maf û azadiyên Kurdan hereketek deynin. Ji bo vê em gihan hevdu. Danûstendin çêbû, ev hereket fireh bû, gihast Enqerê, Diyarbekirê û ji gelek herê-mên Kurdistanê iştirak çêbûn. Gelo bi çi rê mumkun e maf û azadiyên Kurd bîn parastin. Partiyên siyasî li gor qanûnên Tirkîyê ne mumkun bû ku bi navê Kurdî bîn danîn. Qanûna kome-lan jî ne musaît bû ku bi navê Kurdî bîn danîn. Gelo çi rê hebû ku em karibûn bimeşînin. Piştê gotin emê weqfekê deynin, dewlet nikare bibe asteng. Li ser waqfekê biryar hat girtin. 90 kesî weqf damezrand. Wan jî di nav xwe de

Şerafettin Elçi:

"DEP kopiya HEP'ê ye"

11 kes ji bo Komîta karger hilbijartin. Ji van 11 kesan jî serok û cîgirê serok û berpirsiyarê aborî hat hilbijartin.

Armanca weqfê di prensîbên weqfê de hatiye nivîsandin. Dibêje ku her millet lazim e qedera xwe bi destê xwe tayîn bike û em ji vê re hurmet nîşan didin. Û em li hemberî hemû kedxwariyê ne. Li ser van prensîbên esasî armanca weqfê ew e; dîroka gelê Kurd, zimanê Kurdî, çanda Kurd, folklo-ra Kurd biparêze û li ser van lêk-olînan bike, wan berhev bike û bide belav kirin. Ji bo vê konfe-ransa bide, ji bo Kurdan karibe di-bistanan veke. Bi kurtayî armanca Weqfê ev in.

Şertê milletbûnê

Esas armanca me ya girîng ji weqfê ku navê Kurdî li Tirkîyê resmî bibe çareserkin. Wek her milletî muesesên Kurdî yê millî lazim e, hebin. Heta Kurd nebin xwediyên muesesên millî, nabin millet. Ji bona vê lazim e muesesên Kurdî yê xas hebin. Lazim e em vêya bi dewletê resmen bidin qebûl kirin. Heger ev weqfa me resmî bibe tescilkin, wê gavê rê vedibe.

Esas armanca me ya girîng ji weqfê ew e ku navê Kurdî li Tirkîyê resmî bibe qebûl kirin. Wek her milletî muesesên Kurdî yê millî lazim e, hebin. Heta Kurd nebin xwediyên muesesên millî, nabin millet. Ji bona vê lazim e muesesên Kurdî yê xas hebin. Lazim e em vêya bi dewletê resmen bidin qebûl kirin. Heger ev weqfa me resmî bibe tescilkin, wê gavê rê vedibe.

sên Kurdî yê xas hebin. Lazim e em vêya bi dewletê resmen bidin qebûl kirin. Heger ev weqfa me resmî bibe tescilkin, wê gavê rê vedibe. Îcar ji vê pê de muesesên Kurdî yê resmî li hemû herêman tîn danîn. Yanî wek komele tîn danîn, wek partiyên siyasî tîn danîn.

Me qerar stend, me got di navê weqfê de wê guhertin çênebe, navê weqfê "Weqfa Maf û Azadiyên Kurd" e. Ev nav wê neyê guherandin, ya muhîm ev nav e. Li gor şertan wê xebat bibe kirin.

Li gor qanûna Tirkîyê wexta weqfê bibe vekirin, divê meriv muracaatê mahkemê bike, mah-keme lazim e weqfê tescil bike û di rojnama resmî de bibe îlan kirin.

Di sala 1992'an di meha Tem-muzê de me muracaatê mahkemê kir. Me got, bi navê "Maf û Aza-di-yên Kurdan" me weqfekê ava ki-riye û armanca weqfê me da wan, lazim e ev weqf bibe tescilkin. Gotin li gor usula qanûnê wexta weqfê bibe danîn, Berpirsiyariya Weqfa Giştî ya Tirkîyê vê mutea-lê dike. Berpirsiyariya Weqfa Giştî gotin li gor qanûnan li ser navê Kurdî weqf nayên danîn.

Me ji mahkemê re got ev qanûnên Tirkîyê, qanûnên ne de-mokratîk in. Tirkîye dewleteke welê ye ku peymanên wê bi dewletên cihanê re hene, Tirkîye



Şerafettin Elçi: "HEP ne partiyeke serbixwe bû, ji derveyî partiye sewq û îdare tê kirin. Ji bo vê HEP'ê îtibara partiyeke legal nedidit. Roj bi roj milletê Kurd jî xwe ji HEP'ê dida aliyekî. (Foto: Armanç)

pirsiyarên hemû partiyên Tirkîyê beşdar bînin.

Armanç: Ji bilî weqfa we, li Tirkîyê weqfek din heye, Weqfa Kultura Kurdî. Ferqa van çi ye, çima du weqfên Kurdî?

Elçi: Ev pirs gelek di cîh de ye. Ev muesese muesesên millî ne Kurdan in. Lazim e muesese ne di bin emrê siyaseta de bin. Ji bona vê ev weqfa me daniye ne di emrê çî siyaseta da ye. Gelek siya-set tê de hatine ber hev, lê ev weqf ne malê siyaseta ye û ne di bin emrê wan de ye. Armanca weqfê ew e ke hizmeta gelê Kurd bike.

Weqfa din ya ku tu dibêji, ew mixabin wek gelek tiştan di bin siyaseta de din de ye. Di bin emrê wan de ye, di bin dîrektîfa wanda ye, ji bo na wê me munasib nedît em bi hev re kar bikin. Muesesên millî lazim e serbixwe bin, tu derî ve girêdayî nebin. Yanî sebebên ku me û wan bi hev nekir ev bûn. Ev însanên ku tu dibêji, me ew jî dawetê weqfa ku me dameziran-din kiribû, lê dîtin piranî ne li aliyê wan e, rabûn ji platforma me xwe vekîşandin û çûn bi lez û bez weqfeke din danîn. Esas dest-pêka me berî weqfa wan bû, ew ji me weqetiyên.

HEP ji derve dihat îdare kirin

Armanç: Her çiqas partiyeke wek HEP hebû jî gelek ronakbîrên Kurd û aliyên cuda yê civata Kurd li derveyî wê man û di nav hewldaneke ku alternatîfeke nuh ya partiyeke legal peyda bikin û komisyona ji terefê we hatibû danîn jî di nav vê hewldanê de bû. Tevî ku HEP hebû, we çima pê-wistiyeke weha dît?

Elçi: HEP, navê wê partiyeke legal bû, lê wek partiyeke legal nedimeşiya. HEP ne partiyeke serbixwe bû, ji derveyî partiye sewq û îdare tê kirin. Ji bo vê HEP'ê îtibara partiyeke legal nedidit. Roj bi roj milletê Kurd jî xwe ji HEP'ê dida aliyekî. Kelkê zanibû di riya HEP'ê de siyaseteke legal ne mumkun e bê meşandin, çunkî HEP bû wek partiya fraksiyone-kê. Wek partiyeke legal, bûbû partiyeke îlegal. Ev damge lê ha-tibû danîn. Ji bo vê him di nav Tirkîyê de îtibara wê nemabû, him jî di dinyayê de zêde îtibara wê nebû. Roj bi roj gelê Kurd jî ji HEP'ê sar dibû. Çunku dema HEP sala 1991'ê kete hilbijartinê sozên mezin ji gelê Kurd re dabû, gotibû meselê gelê Kurd wê di parlamentoyê de HEP hel bike. Piştî hilbijartinê HEP'ê siyasetek ji bo gelê Kurd nikaribû bi-meşîne û tu giraniya wê çênebû.

Partiyeke demokrat, ne çînî

Ji ber vê pêwistiya partiyeke legal hebû ku ew di nav xwe de xwe îdare bike, ne ji der ve bibe îdarekirin, ne di bin emrê tu partiyeke îlegal de be. Ev ihtiyac hebû û partiya bibe danîn lazim bû partiyeke demokrat be, ne partiyeke li ser bingehê sinifan be, ne partiya weke HEP'ê danî, Partiya Ked a Gel be, partiya gelê Kurd be. Yanî ev partî partiyeke weha be ku hemû gelê Kurd temsîl bike û hemû terefên gelê Kurd tê de cih bigrin.

Komeleya Pêşketina Kurdistanê

(Kürt Teali Cemiyeti) -II-

Zinar Soran

CIHÊBÛNA NAVA KOMELEYÊ Û HINEK HEWILDANÊN JI BO GIRTINA WÊ

Ji ber nerîn û armancên xwe yên siyasî, Komeleya Pêşketina Kurdistanê her gav neçar maye ku xebat û jiyana xwe ya komeleyî di bin tade, zilm û sitemkariya hukûmeta Osmanî de bidomîne. Gava Komeleyê dest pê kiriyê ku liq û şaxên xwe di nava Kurdistanê de ava bike û di warê xebata dîplomasî de hinek gavên berbiçav avêtîye, zilm û zordarî li ser Komeleyê diwartir û berfirehtir bûye û rêxistinên parastina Osmanî, xebat û tevgera endamên Komeleyê ji nêzikî ve xistine bin kontrolê.

Mustefa Kemal jî, bi alîkarî û piştigiriya hukûmeta Osmanî xwestiye liq û şaxên Komelê yên li Kurdistanê ji holê rake û xebat û tevgera Kurdî di nava welêt de bitefîne. Ji ber ku wî tevgera Kurdî li hemberî armanc û planên xwe astengek herî mezin didît. Hîn di dema civandina "Kongreya Sivasê" de, wî bi hinek axa û feodalên kurdan re têkiliyên germ daniye û di bin durûtiya "yekitiya Osmanî", "muqedestiya Xelîfetê" û "biratiya tirk û kurdan" de, siyasat û xebatek diwar li hemberî rêxistin û tevgera kurdî meşandiye. Mustefa Kemal di telgrafên ku ji Hecî Kaya û Şêxzade Mistefa Axa re şandiye, wê siyasat û durûtiya xwe weha dide diyar kirin:

"Heta ku kesên mîna we xwedî ol û namûs hebin, wê tirk û kurd wek du birayên heqîqî ku ji hevdu nayên cihêkirin bijîn û bê guman wê li dora meqamê Xelîfetê weke wicûdeki ku nayê hejandin û li hemberî dijminên hundur û derve weke kelehek ji hesin bimîne" (28).


Mustefa Kemal di Tebaxa 1919- an de jî, ji hinek serokeşîr, şêx, axa û feodalên kurdan re mesajan dişîne. Di gel biryarên Kongreya Erzûrûmê, Mustefa Kemal di mesajên xwe de, ji şêx, axa, serokeşîr û feodalên kurdan daxwaz kiriyê ku ew li hemberî Ermeniyên û "lîstikên dijminên" dîn tekoşinê bidin. Telgraf ji wan kesan re hatin şandin: Ji Mûtkiyê Hecî Mûsa, ji Bedlîsê Şêx Abdulbaqî Efendiyê Kufrewizade, ji Mûşê Dervîş Ömer Axa, Resûl Axa, mebûsê berê Sadullah Efendî, ji Norşînê Şêx Mahmûd Efendî, Şêx Ziyaeddîn Efendî, ji Xerzan Cemîlê Çeto (29).

Di dema ku Şerîf Paşa û nûnerên Ermeniyên hevpeymanekê îmze dikin û pêşkêşî "Konferansa Aştiyê ya Parîsê" dikin, daxuyaniyek li ser navê Seyîd Ebdulqadir di rojnamek ku li Stenbolê û bi fransî derdiket, "Jornal

d' Orient"ê de tê weşandin. Di wê daxuyaniyê de, tê diyar kirin ku Seyîd Ebdulqadir pişt-tgiriya wê Peymanê dike. Li ser wê daxuyaniyê, hem li "Meclîsî Mebûsan" û hem jî di rojnameyên Tirkan de, li dijî serokê Komeleya Pêşketina Kurdistanê kampanyek gelek mezin dest pê dike û daxwaza ku Seyîd Ebdulqadir dev ji serokîya "Şûrayî Dewletê" berde, derdixînin pêş: "Seyîd Ebdulqadir ji aliyekî Serokê Şûrayî Dewletê ye, ji aliyê din jî serokê komeleyekê ye ku Kurdistanê serbixwe dixwaze. Ya bila ji serokîya Şûrayî Dewletê îstifa bike, ya jî bila dev ji Kurdistanê serbixwe berde" (30).

Li ser wê kampanyayê û êrişan, Seyîd Ebdulqadir daxuyaniyekê dide rojnameyan, Di wê daxuyaniyê de, ew diyar dike ku "Kurd serxwebûnê naxwazin, ji Kurdistanê re îdareyek Otonom daxwaz kirin". Ev daxuyaniya dibê sedemê nakokî û cûdatiya nerînên nav Komelê bi awakî eşkere derkeve ser rûyê erdê û destpêka cihabûna nava wê. Li gor ku Zinar Silopî dinivîsîne, piştî wê daxuyaniyê, beşek endamên Komîteya Birêvebir ji Komeleya Pêşketina Kurdistanê vediqetin û bi navê "Komeleya Tevgerêdana Civakî ya Kurd" (Teşkilat- i İçtimaiye Cemiyeti) rêxistinekê ava dikin (31).

Bêguman ew veqetandin û gurbûna nakokiyên di nava Komeleyê de, tevger û xebata wê gelekî hejar kiriyê û di xebat û hewildanên dîploma-sî û civînan navneteweyî de, tesîrek berbiçav ya neyînî kiriyê. Ew rewşa ji bo hêzên Mustefa Kemal jî bûye avantajek gelekî mezin. Ji xwe gava em li wan konferansên piştî "Konferansa Sevrê" dînerin, em êdî nûner û delegasyonên kurdan nabînin. Di 21- ê Sibata 1921- ê de, gava "Konferansa Londonê" dest pê dike, di dewsa kurdan de, vê carê bi rîya hukûmeta Stenbolê, hukûmeta Ankarayê tê dawet kirin. Li ser dawetiya resmî ya dewleta Îtalya, Hukûmeta Ankara bi delegasyonê xalis-muxlus ji nîjadperestên tirkan pêkhatî beşdarî ve Konferansê dibê. Bi wî awayî careka din derket holê, ku pîrsa Kurdî ji bo dewletên hevpeyman ewqas ne girîng bû. Nêzîkiya wan ya demekê jî, ne ji bo çavên reş yê kurdan bû; ew, hew ji bo plan, dabeşkirin û kontrola wê navçeyê bû. Ji bo plan û berjewendiyên wan çî pêwîst ba, ew dikirin û kî bêtir xurt û nêzîkî berjewendiyên wan bana, "hevalbendiya" wan dikirin. "Prensîbên Wilson, "Mafê Neteweyê Bîndest û Mirovî" jî, her di nava wan sinorên plan û menfaetên wan de, tuxûbkirî diman û ji perçakî hesabên dabeş-irana nû pê ve, ne tişteki din bûn. Nisbî be jî, gava Dewletên Hevpeyman û Hukûmeta Ankarayê li ser dabeş-kirina



Serokê Komela Pêşketina Kurdistanê Seyid Abdulkadir

Kurdistanê li hevdu kirin, rapora emelyata perçe-kirina Kurdistanê jî, di 23- ê Nîsana 1923- an de, bi awakî "resmî", li Lozanê hate îmze kirin.

Di hîlbijartina giştî ya sala 1919- an de, weke "Partiya Azadî û Lihevhatinê", Komeleya Pêşketina Kurdistanê jî beşdarî hîlbijartinê nebûbû û hîlbijartin veto kiribû. Di wê hîlbijartinê de, gelek hevalbendên "Kuvayî Millîye" jî wek parlamenter hatibûn hîlbijartin. Ew meclîsa dawî ya dewleta Osmanî, di 20- ê Çeleya Paşin ya 1920- î de, "Sûnda Neteweyî" (Misakî-Milli) qebûl kir û îlan kir.

Di wê Meclîsê de, giraniyek baş kete destên hevalbendên Mustefa Kemal. Meclîsê, di 19- ê Sibata 1920- î de, li ser pîrsa kurdî civîna xwe ya yekem pêk anî. Di giraniyê de parlamenterên nêzîkî Mustefa Kemal, gelek êriş û rexneyên giran ji Komeleya Pêşketina Kurdistanê û serokê wê Seyîd Ebdulqadir re anîn. Ji bo Hukûmeta Osmanî, hebûna Komelê û xebatên wê roj bi roj bêtir tehlûke dihate dîtin û diviyabû êdî ji holê bihata rakirin.

Ji xwe, Mustefa Kemal jî destpêkê de, li dijî tevgera kurdî ya neteweyî bû. Hîn ew li Amasya bû, di 15- ê Hezîrana 1919- an de, vê telgrafa bi şîfre ji waliyê Diyarbekirê re dişîne: "Her komeleyek ku dixwazin fesadiyê li derxînin, divê di ci de bê belav kirin...Girtina tedbîrên weha, vatiniyek welatperwerî ye. Ji ber vê yekê, ez bi her awayî bi wan tedbîrên ku we li hemberî Komela Kurd girtiye re me" (32).

Di 16- ê Hezîrana 1919- an de jî, Mustefa Kemal li ser tevgera kurdî û Komeleya Pêşketina Kurdistanê, ji Kazim Karabekir re nivîsandîye, ku armanc wê Komeleyê, serbixebûna Kurdistanê bû. Ji bo vê yekê jî hate girtin. Gelekî balkêş e, ku piştî wê nivîsandina Mustefa Kemal bi du rojan, di 18- ê Hezîrana 1919- an de, li Stenbolê civîna Lijneya Wezîrên Hukûmeta Osmanî li ser pîrsa kurdî û Komeleya Pêşketina Kurdistanê û tedbîrên li hemberî wê dicive. Di wê civînê de, Lijneya Wezîran biryar digre, ku divê li Kurdistanê tevgerêdana leşkerî ji nû ve bê hûnandin û berfirehtir bibe; memûrên kurdan ji Kurdistanê re bînan şandin; nişan û paye li serokên eşîrên kurdan re bê belev kirin û bi rutbeyan bînan xelat kirin; Kurdên ku wê ji Kurdistanê bînan koçkirin li Ankara û Konyayê bînan cîwarkirin û heywan û çadir li wan bînan belavkirin; ji bo propogandaya di lehê dewleta Osmanî de, ji bo Kurdistanê lijneyek şêwêrê bê damezirandin. Lijna Wezîran li ser Komeleya Pêşketina Kurdistanê jî radiweste û ji bo "nepewîstiya" wê biryar digre (33).

Ew bûyera jî, bi awakî eşkere dide diyar kirin, ku bê çawa armancên Mustefa Kemal û hukûmeta Osmanî, li heberî tevgera Kurdistanê û xebatên Komeleya Pêşketina Kurdistanê dibûn yek û ji bo tefandina wê tevgerê û rêxistinîya Komelê, piştgirî û alîkariya hevdu dikirin.

Teva wê biryara "nepewîstiya" Komeleya Pêşketina Kurdistanê û teva ku hinek liq û şaxên Komelê

yên li Kurdistanê ji aliyên berpirsiyarên navçeyî ve hatibûn girtin jî, navenda Komelê ya li Stenbolê hebûn û xebata xwe domandiye. Di 11- ê Çiriya Pêşin ya 1920- de, vê carê hukûmeta Osmanî biryara girtina Komeleyê daye. Ew biryara jî di pratîkê de neketiye jiyane û ne bi xurtî be jî, Komeleyê hebûna xwe demek din jî domandiye. Li gor ku Behcet Cemal dide diyar kirin, Komeleya Pêşketina Kurdistanê ne bi hêz be jî, hebûna xwe heta îlankirina "Komara Tirkîyê" domandiye... (34).

Di wê dema ku nakokiyên nava Komeleyê gurtir û êrişên hukûmeta Osmanî û Mustefa Kemal li ser Komeleyê diwartir bûbûn, serhildana Koçgirî dest pê kiribû. Ji agahdariyên Dr. M. Nûrî Dersimî em dizanin ku Komeleya Pêşketina Kurdistanê beriya serhildana Koçgirî, ji bo avakirina şaxên Komelê û xebata neteweyî hewil daye ku mîralayekî leşkerî bike qaymîqamê Egîne û Dr. M. Nûrî Dersimî jî bike Veterinerê qezayên Zara, Divrîgî û Kangalê ku bikaribe bi hêsanî di nava eşîrên Kurd ên Sêwasê de bixebite. Daxwaza tayînkirina mîralayê kurd nehatiye qebûl kirin, lê Dr. M. Nûrî Dersimî bi wê vatiniyê di Çiriya Pêşin ya 1918- an de, dihere navendiya Koçgirî. Di wê demê de mudurê nehiya Umranîyê jî Alîşan bû (35). Wan herdu niştîmanperwer û mîrxasên kurd gelek xebatên hêja û giranbîna kirin û li gelek deverên wê navçeyê liqên Komelê damezirandine. Lê wer xuya ye ku dîr e têkiliyên wan û navenda Stenbolê bi awakî rêkûpêkî nehatine domandin. Ji xwe gava mirov li serhildan û tevgera Koçgirî dinere, hebûn û pêşengiya Komeleya Pêşketina Kurdistanê nayê dîtin. Gava Dr. M. Nûrî Dersimî li ser sedemên biserneketina tevgera Koçgirî radiweste, di derhaqê Komeleyê de weha dinivîsîne:

"Gava tevgerê dest pê kir, Komeleya Pêşketina Kurdistanê belav dibû û ji bo hinek endamên wê jî îhmalkarî û guhnedanî, hinek jî reviyabûn derveyî Stenbolê û ji beşdariya tevgerê bê par mabûn; imkanên ku tevgerê bi awakî plankirî û bi aheng li derdora navendekê bimeşîne nemabû" (36).

Di hinek belgeyên Îngilîzan de jî, li ser wê nakokî û cihêbûna Komeleya Pêşketina Kurdistanê hatiye rawestandî; di wan belgeyan de, hatiye diyar kirin ku Bedirxanî û hinek ronakbîrên kurdan li dijî Serokê Komeleyê Seyîd Ebdulqadir û birûbaweriyên wî yê di derheqê otonomiyê de derketin û danin diyar kirin ku êdî Şerîf Paşa nûneriya Komeleyê nake. Li ser wan bûyera Şerîf Paşa jî telgrafekê dişîne û ji serokîya Delegasyonê kurdan îstifa

Lêkolîn

Piştî îlankirina "Komara Tirkiyê", gelek endamên komeleyê ji ber xebat û çalakîyên xwe yê berê, ji aliyê Hukûmeta Mustafa Kemal ve, bi cezayên mezin hatin cezakirin. "Dadgeha İstiqlâlê ya Şerqê" (Şark İstiklal Mahkemesi) ya ku piştî şikestina serîhildana Şêx Saîd li Diyarbekirê hatibû li dar xistin; di 23'ê Gulana 1925'an de, ji bo serokê "Komeleya Pêşketina Kurdistanê" Seyîd Ebdulqadir, kurê wî Seyîd Mihemed, Kemal Fewzî, Sadiyê Paloyî, Xoce Eskerî û Abûqat Hecî Axtî biryara daliqandinê dide û di 27'ê Gulanê de, li gorî wê biryarê ew tîndaliqandin.

dike. Bêguman ew cihêbûn û nakokiyên di nava kurdan de, ji bo tirkan bidestxistinek gelek mezin bû. Di dema ku pîrsa kurdî di nava raya giştî de ewqas pêş de çûbû, bi awakî eşkere derketina wê nakokî û cihêbûnê, ji bo tevgera kurdî bêşansiyek gelek mezin bû (37).

Erişên ji aliyên Hukûmeta Osmanî, Mustafa Kemal û hevalbendên wî, nakokiyên di nava Komeleyê de û bi taybetî veqetandina hinek pêşeng û endamên wê, tîndaliqandinê mezin li ser xebat û têkoşîna Komeleya Pêşketina Kurdistanê hiştîye; her ku çûye xebat û tevgera wê hejar bûye û di pratîkê de ji holê rabûye. Di dema damezirandina "Komara Tirkiyê" de êdî hebûna komeleyê nayê ditîn.

Di destê me de, tarîxek bi roj û meh tune ku nişan bide, bê Komeleyê heta kîjan demê jiyana xwe domandiye. Lê em dizanin ku piştî "Kuvayi Milliye" (Hêzên Neteweyî) yê Mustafa Kemal, di îlona 1922-an de, di şerê nava Tirk û Yewnanîyan de bi ser ketine; tade, zilm, zordarî û êrişên xwe yê li ser mûxalefeta xwe û her weha li ser pêşeng û tevgera kurdî jî girantir û dijwartir kirin. Li gorî Zinar Silopî di nivîsîna; piştî serketina "Hêzên Neteweyî" (Kuvayi Milliye) li hemberî Yewnanîyan, Dewletên Hevpeyman çavên xwe ji tirkan re girtine. Ji ber wê yekê jî, teva ku Stenbol di binê dagirkirana Dewletên Hevpeyman de bû, serleşkerê "Kuvayi Milliye" Rafet Paşa tîndaliqandinê û ji aliyên qebralixiyek pir mezin ya hezkerên "Kuvayi Milliye" tîndaliqandinê kirin. Rafet Paşa bi dengê bilind ji xelkê Stenbolê re dide diyar kirin ku wê hêzên "Kuvayi Milliye" tîndaliqandinê. Hevalbendên "Kuvayi Milliye", Wezîrê Hundur ê Osmanîyan û rojnemavanê bi nav û deng Alî Kemal ji Stenbolê direvînin û li Îzmîrê lîncê dikin. Ev bûyera çavên muxalîfên "Kuvayi Milliye" gelekî ditirsîne û nizanin bê çî bikin.

"Komeleya Tevgerîdana Civakî ya Kurd" (Kürt Teşkilatı İctimaiye Cemiyeti) di civîna xwe ya talî de, digêje wê baweriyê ku êdî mercên xebatê li Stenbolê û Îzmîrê nemane û biryar digre ku endamên navendî ji Stenbolê derkevin. Lê ji ber hinek sedemên taybetî, hinek ji en-

daman neçar dimînin ku li Stenbolê bimînin. Ji xwe "Partiya Neteweyî ya Kurd" (Kürt Milli Fıkrası) jî, bi "Komeleya Tevgerîdana Civakî" re herketê dikir. "Komeleya Pêşketina Kurdistanê", çalakîyên xwe ji binî de rawestandibû (38).

Piştî îlankirina "Komara Tirkiyê", gelek endamên komeleyê ji ber xebat û çalakîyên xwe yê berê, ji aliyê Hukûmeta Mustafa Kemal ve, bi cezayên mezin hatin cezakirin. "Dadgeha İstiqlâlê ya Şerqê" (Şark İstiklal Mahkemesi) ya ku piştî şikestina serîhildana Şêx Saîd li Diyarbekirê hatibû li dar xistin; di 23'ê Gulana 1925'an de, ji bo serokê "Komeleya Pêşketina Kurdistanê" Seyîd Ebdulqadir, kurê wî Seyîd Mihemed, Kemal Fewzî, Sadiyê Paloyî, Xoce Eskerî û Abûqat Hecî Axtî biryara daliqandinê dide û di 27'ê Gulanê de, li gorî wê biryarê ew tîndaliqandin. (38).

(1) Jîn, çapa nû, Cild 1, Weşanxana Deng, Uppsala - Sweden, r. 22.

(2) Tarîk Zafer Tunaya, Tirkiyê de Siyasal Partiler, cild 2, Weşanê Weqfa Huriyetê (Hürriyet Vakfı Yayınları), Stenbol, Sibit 1986, r. 1986.

(3) Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Weşanên ÖZ-Ge, Stenbol, r. 56.

(4) Dr. Vet. M. Nuri Dersimî, Kürdistan Tarihinde Dersim, Çapxaneyê Anî, Halep, r. 120.

(5) Zinar Silopî, berhema navê wê derbasdibe (b.n.d.) r. 56-57.

(6) Ji bo wê bahsê binere: Tarîk Zafer Tunaya, b.n.d. r. 186. Vedat Şadili, Tirkiyê de Kürçülük Gerçeği ve İsyânlar, Weşanên Kon, Ankara, 1980, r. 159. Dr. İbrahim Etem Gürsel, Kürçülük Gerçeği, r. 44. Uğur Mumcu, Kürt İslam Ayaklanması, Weşanên Tekin, Ankara, 1991, r. 183-184.

(7) Ji destûra Komeleya Pêşketina Kurdistanê.

(8) İsmail Göldaş, Kürdistan Teali Cemiyeti, Weşanên Doz, Stenbol, Çirya Paşin 1991, r. 39-45.

(9) Nesimi Fıratlı, "Resmî ideolojinin sunduğu gerçekler, Kürt ulusal demokratik hareketleri" Kovara Deng, Stenbol, hejmar: 12 (Hezîran 1991), r. 36-37.

(10) Ahmet Mesut, İngiliz Belgelerinde Kürdistan, Weşanên Doz, Stenbol, Gulan 1992, r. 42-45.

(11) Zinar Silopî, b.n.d. r. 56.

(12) Avni Aydoğan, "Kurtuluş, Kuruş ve Sonrası" r. 9.

Di derheqê tarîxa wê peymanê de, Nesimi Fıratlı û Mehmet Bayrak jî, 20'ê Çirya Pêşîna 1918-an didin û navê Mustafa Sabrî jî nerivîsandin. Kovara Deng, hejmar: 13 (Tîrmeh 1991), r. 20-27.

(13) Uğur Mumcu, Kürt- İslam Ayaklanması, Tekin Yayinevi, r. 119.

(14) Ji bo wê bahsê binere: Dr. Nuri Dersimî, b.n.d. r. 120. Zinar Silopî, b.n.d. r. 60-61.

(15) Yê ku ji Dr. Blech Şirkuh, El-Qeziyel Kurdiyye (Maziya'l Kurd ve Haziruhum), Kahîre, 1930, r. 65-66 neqlê dike! Malmîsanîj, Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet, r. Weşanên Jîna Nû, Stockholm, 1986, r. 77-78.

(16) Binere: Rêznameya "Komeleya Kurdistanê", Tunaya, b.n.d. r. 213.

(17) Kovara Jîn, cild: 5, hejmar: 21, r. 3-8.

(18) Binere: Tunaya, b.n.d. r. 190. Kovara Deng, hejmar: 13, r. 20, 26-27. Uğur Mumcu, b.n.d. r. 119.

(19) Ji bo liq û şaxên Komeleya Pêşketina Kurdistanê binere: M. Emîn Bozarlan, "Haydarîyên Giştî di heqê Kovara Jîn' de", Jîn, cild 1, r. 35. Dr. Nuri Dersimî, Kürdistan Tarihinde Dersim, r. 122, 280. Dr. İbrahim Etem Gürsel, b.n.d. r. 44.

(20) Zinar Silopî, Doza Kurdistan, r. 60.

(21) Binere: Kovara Jîn, hejmar: 21, 18 ê Hezîrana 1935.

(22) Bazil Nikitiin, Kürtler, Özgürlük Yolu Yayınları, Tîrmeh 1986, r. 346.

Mixabin, di derheqê "Komeleya Rizgariya Kurdistanê" ya jî "Komeleya Rizgariya Kurdistanê" de, agadariyek berfireh di dest me de tune.

(23) Jîn, Weşanxana Deng, cild: 1, r. 29-30.

(24) Jîn, Weşanxana Deng, cild 5, r. 4-5, (25) Ev peyman ku di nava Ermenî û Kurdan de çêbûye, di pirtûka Garo Sasunî ya bi navê "Kürt Ulusal Hareketleri ve Ermeni- Kürt İlişkileri" (Weşanên Orfeus, Stockholm r. 164-165) de jî, hatiye weşandin.

(26) Dr. Nuri Dersimî, b.n.d. r. 171.

(27) Ji bo wê peymanê binere: Zinar Silopî, b.n.d. r. 58-59. Dr. Abdurrahman Qasimlo, Kürdistan û Kurd, Weşanên Jîna Nû, Swêd- İlona 1991, r. 54-55. Dr. Şivan, b.n.d. r. 65-66.

(28) Dr. Salahi R. Sonyel, Türk Kurtuluş Savaşı ve Dış Politika, Weşanxana "Türk Tarih Kurumu", Ankara- 1967, cild 1, r. 121-122.

(29) M. A. Gasaratyan, Yeni ve Yakın Çağda Kürt Hareketleri, Weşanên Jîna Nû, Swêd, İlona 1991, r. 126-127.

(30) Zinar Silopî, b.n.d. r. 60-61.

(31) Zinar Silopî, b.n.d. r. 61.

(32) M. A. Gasaratyan, b.n.d. r. 125-126.

(33) İsmail Göldaş, Kürdistan Teali Cemiyeti, r. 216, 222.

(34) Binere: İsmail Göldaş, b.n.d. r. 217, 227.

(35) Binere: Dr. Nuri Dersimî, b.n.d. r. 121-122.

(36) Dr. Nuri Dersimî, b.n.d. r. 170.

(37) Binere: Belgeya FO 371/ 5068, nr: 5063, 20-ê Gulana 1920. Ji pirtûka Ahmet Mesud ya bi navê İngiliz Belgelerinde Kürdistan, r. 133-134.

(38) Binere: Zinar Silopî, b.n.d. r. 104.

(38) Binere: Aziz Aşan, Şeyh Sait Ayaklanması, Stenbol, Çileya Pêşîna 1991, r. 34.

Di 28-ê Hezîrana 1925-an de jî, ew "Dadgeha İstiqlâlê" biryara idama serokê serhildanê Şêx Saîd û 47 kesên din dide. Ji nava wan, cezayên Qaymeqamê Çebakçîrê Huseyîn Hilmi, "ji bo xizmetên wî yê kevn" û yê Hesênê kurê Salih Beg jî, "ji ber biqûkbûna emrê wî" tîndaliqandin. Şêx Saîd û kesên din jî, di şeva navbêna 28 û 29-ê Hezîrana 1925-an de tîndaliqandin. Aziz Aşan listeya wan kesên ku biryara daliqandinê ji bo wan hatibû girtin, di wê pirtûka xwe de weşandiye. Binere: Aziz Aşan, b.n.d. r. 39-40.

Ambargoya aborî li dijî Kurdistanê azad

Serokê PDK-Iraqê Mesûd Berzanî û Serokê YNK'ê Celal Telabanî nameyek ji Sekreterî Giştî yê Netewên Yekbûyî Butros Galî re şandin ku ew çareyek bo mesela pere li Kurdistanê peyda bike

Di 5' Gulanê de hukûmeta Iraqê biryara vekîşandina 25 Dînarê ku di banqayên Swîsrê de çap dibû stend. Wexta Iraqê ev biryar girt, perê Iraqê di bazara Kurdistanê de nêzî milyarek Dînar bû û nivê vî pereyî jî ji 25 Dînarên çapa Swîsrê pêk dihat. Yanî bi wê biryara hukûmeta Iraqê re, Kurdistanê niv milyardê zêde kir û ji bilî wê jî bûhayî dest pê kir. Bi taybetî ar, rûn, birinc û şeker gelek bûha bûn.

Mebesta Iraqê jî wê ambargoyê ev e ku Kurdistan di hundirê xwe de qels bibe û tevlihevî û kaos dest pê bike.

Li ser wê biryara Iraqê Serokê PDK-Iraqê Mesûd Berzanî û Serokê YNK'ê Celal Telabanî di 7'ê Gulanê de nameyek ji Sekreterî Giştî yê Netewên Yekbûyî Butros Galî re şandin ku ew çareyek bo mesela pere li Kurdistanê peyda bike.

Name bi kurtî wiha ye.

.. "Eger hukûmeta Iraqê biryara xwe paşve nestîne, divê yek ji van ser alternatîfan pirsgirekê çareser bike.

1- Banka Rafideyan ya li bajarê Hewlêrê berdewam bike 25 Dînarî çapa Swîsrê bi kar bîne.

2- Pereyê Kurdistanê Federe bête çêkirin.

3- Pereyê dewleteke din wek Lîrayê Tirkiyê li başûrê Kurdistanê bêt bi kar anîn.."

Li ser wê biryara Seddam, Celal Telabanî bi resmî muracatê dewleta Tirkiyê kir ku ew li Kurdistanê azad Lîrayê Tirkiyê bi kar bînin. Ev daxwaz ji aliyê Tirkiyê ve ne hat qebûl kirin, ne jî hat redd kirin.

Tirkiyê jî wê yekê ditirse ku ger Kurdên Başûr Lîrayê Tirkiyê bi kar bînin, wê %75'ê nifûsa Kurd bikeve nav "sînorên" Tirkiyê. Û ev jî wê bibe destpêka yekîtiya Kurdan.

Na ku Tirkiyê nehêle Lîrayê wê bi bi kar bê, wê gavê jî Kurdên Başûr ya wê perê xwe çap bikin yan jî Dolar, Paund yan jî Tumenê Îranê bi kar bînin. Yanî ji Kurdan re rê vedibe ku Kurd dewleta xwe ya serbixwe ava bikin. Îcar ji bo wê Tirkiyê bê qerara resmî be jî musade dike ku di bazara Kurdistanê Başûr de Lîrayê Tirkiyê bê bi kar anîn.

Parlamentê Asûrî Fransîs Yûsif Şabo hat kuştin

Endamê serkirdeyatiya Tevgera Demokratîk a Asûrîyan û endamê Parlamentoya Hukûmeta Kurdistanê Fransîs Yûsif Şabo di 1'ê Hezîranê de li Dihokê li ber deriyê mala xwe hat şehîtkirin. Li ser şehîtbûna Fransîs Y. Şabo, Tevgera Demokratîk a Asûrîyan beyanek derxist. Di beayaê de tê gotin ku, rejîma Iraqê û destikên wî qatîlên Fransîs in.



Fransîs Yûsif Şabo li Mangêşkê, li wîlayeta Dihokê hatibû dinyayê. Şabo muhendis bû û di hilbijartina Gulana 1992'an de ji bo parlamentoya Kurdistanê wek nûnerekî ciwata Asûrîya hatibû hilbijartin.

Tevgera Demokratîk a Asûrîyan di beyana xwe de wiha dibêje: "Armanca wê cinayetê ew e ku derbe li demokrasî, aşî û pulûralizma îro li Kurdistanê rû daye, bixe. Sebê tîrsa ku ketiye diê rejîma Iraqê ew e ku ciwata Asûrîyan cara yekem e li ser erdê bav û kalê xwe bi hûwiyeta xwe hatiye nas kirin û di parlamentoyê de nisbî hatiye temsîl kirin."

Li ser kuştina Fransîs Yûsif Şabo, Serokê Parlamentoya Kurdistanê Cewher Namik Salim beyanek derxist.

Tevgera Demokratîk a Asûrîyan û Buroya Hukûmeta Kurdistanê di 13'ê Hezîranê de ji biranina Şabo li Stokholmê civînek çêkirin. Di civînê de li ser jiyana û têkoşîna Şabo hat rawestan.

Yara min... carake dîtir ez de bejna vê sirûde bi awazên penaber û revendan, bi eşdîtina qonaxê bi hîrîna hespekî serberdayî, bixemilînim... Di vê cihana sêwî de, di nav tevna vê bîntengiya ebedî de, li bin konê vê daristana bê dar û bê xwedî, hemû sitranên min yên kevnar bi pîrîskên bêrîkirina we dişewitin.

Zarokên ku di kolanên we de bi heftok û bi xaran dilîstin, yên ku esmanê di navbera (Amûdê) (Til-hebeşê) bi balefirên kaxezî û bi toza ardîni sipî dikirin, zarokên we yên ku di dergûşa dilê min de ketibûn xeweke rawan û şerîn, anuha, kirasê bêdengiyê diçirînin, çeng dibin û kevirên xwe davêjin bîra hişê min...

Jinên we yên bi kiras û xeftan, bi şohiyên rengtûj, bi hibîrî û xizê û bi qemçik û bi pêşmalik, êvarian, germa havîne dadîqurtandin, li ber dergehên herifî li hevdu kom dibûn, bi çavine sistokî mişt kila Sibhanî, li rêwîyan temaşe dikirin, bilaçemk û bîna êvarê li ser serê wan direqîsîn, carcaran bi hûçkên xwe mîşên aramê diqewirandin û diketin gergerîneka jiyane... anuha jinên we, wek stêrkan ji esmanê hişê min dirîjin, guharên zêrînî wekî heyîvan di taristana bîranîne de, çarde şevî dibin...

Erê yara min... Em, li gel mirîşkên rûşûtî û kevokên teqlê û keroşkên bêcîr û pisîkên kedî û karîkên guhliv, "li ser keviya gerdûn" rûniştine. Eger hat û werîse we yê ku dilê me girêdaye qetiya, em dê bi ser şûrê nemanê de bikevin... em dê di sîbera mijankên axîna we de wekî naneke tenûrê, zuha bibin...

Ev şev. Ev kelewaca bi kef, ev devê ji hev, bûye dozexa peyv û

RONO Û SIRÛDÊN BÊRÎKIRINÊ

Li ser keviya gerdûn

pîvanê. Û esmanê li berketiyan hergav bi pîrs û bi xwezî û bi xewnan avis e. Xewn e û çûkên we yên destê sibê li ser pencereyên me yên xwelfrengî hêlinên xwe bi lez û bez, ji qirîskên çavliremana me dirêsin.

(Ne her mirov dikare bistirê... û ne her mirovekî jî şiyana ku, wek sêvekê li ber lingê biyaniyan bikeve, qezenc kiriye/YÊSNÎN/...)

Em li wan herêmên we yên rût û berdayî, wek sisirkan ji himbêza qedere dipengizîn. Em bi wêranê dikeniyên, bi ritma talanê re, me werzên xwe beravêtî wergirtin... Li ber dergehên asê yên xwewîne, em û gavsistiya roka xwe, roka bêçare û xemsar, bê rêber û bê şopvanî, me dide ser piştî pîrs-girêkên qonaxê û hergav oxira dirindane ji ava çavan têr nedibû...

Husa taku tama nav û tîpên we, xweşçêja afsanewî ya dilokên we, zimanê me wenda nekin, em hew diwêrin devê xwe li ber pîrsê bilivînin...

Husa... taku şopa maça we jîndar be, pêjna biskên dotmaman yên ku bûkên çavan derman dikirin ji hişê sipîk û xilêfka çav neçin, em hew diwêrin çavên xwe bixurînin...

Husa... Taku terkên lêvên me şevbûhêrken germ û dilovan, bişîşandina we û olana liblibî ya tiqtîqa we û jena hevokên pêkenî û tinaziyên ji bîr nekin, em hew diwêrin ji dil bikenin...

Husa.. Taku çem û rûbar û cok û çavkanî ji cergê xêz û gotar û sernivîsan, bi şêfî û bi sermestî,

nepijiqin, em hew diwêrin pirtûka evîna xwe ji rekeha sînga xwe derbixin...

Husa... Taku destan û afsan û serbûr û serpêhatî, çirokê miran û şivan û gavanan, taku kavi û pîrevok û keçecînen nazdar, dilop dilop, ji ahenga xwîne nenuqufîn, em hew diwêrin bi rengan re bi-peyivin, di ber gulên re derbas bibin, li esmanê sahi temaşe bikin, nameyên we ji di bin balgehên xwe de weşêrin...

Li seranserî vê şevê tenhatiyê sêdar û pasvanên xwe raxistine. Stêrên şermîn di hizrên xwe de bi tenha ne, kuç û kolan û ev golên gemkirî bi tenha ne. Lal û nêrgîz û tolpan û sîbera benefaşan û xelkên vî bajarî bi tenha ne. Ez û êşa we, renckêşana we û xewrevîneke tîr bi ser sînor û aleyên ve tenhatiyê de dirîjin... Dengbêjê we jî li ser pîtanokên zuha ên ve axina kûr, şîn tê. Digel ku demsal zirz û serhişk in, digel ku katjimêr piştîxûz û bi bawîsk in, tembûra xwe dispêre sipîndar û berûyan, wan, wan tayên spî ên ku di porê daristanê de dibiriqin ji saza xemgîniyê re dike aramgeh û cîvar:

(Lo lo qulingo mi go tu qulingekî ji qulingên deşta ve Mûşe ..Lê tembîka min li te bî tucarî hêlîna xwe çeneke li ser bêxwedî maya Karûşe ...Welle ezê evdalê bejn û bala te me li welatê xerib û xurbetê li ber darê dergûşe ..Evdal im evdalê bejna te me lê)

Yara min ... Em "li ser keviya gerdûn "ne runiştî û ne jî şîpiya

ne . Li avîya rîhanên we û li çil 'esrî ya we, li hendeseya awirên ewran, poşman dibin. Kulîlkên we yên ku di zeviyên xwîna me de hatine çandin, va ne, di mistên me de dibin kevir . Em bi dû erebanên bêzariyê de dilukumin û kutayî li wan deverên we ji destê dayîka xwe wenda bûye .

Biyanînoo.. De sînoran , nasname û pasportên sexte, bêrîkên xwe yên mişt tembî, hîni metîrsiyân bikin û li nasnavên xwe xwedî derkevin..

De gavên lezê û bixçikên xewn û leylandê, karwanê kovandariyê hîni qamir û stîrî û keleman bikin

De kurtegavên xwe, bi hestdarî, mîna hunermendên westiyayî, ji rengên keskesora werayî hîlbijêrin û pûnijandina xwe ya rojane bi çepêrên dûrgehê rawestînin. Taku bager û ziryana ve serdema porkur nikaribe we ji himbêza zarotiyê wergerîne reşxêza sêwîtiyê, werîsên ve qonaxê li newqa xwe bipêçin...

Ha va ji nû ve havîne û bajarê we bi xwelibakirin pêşwaziya tozê dike. Li beramber babelîsk û icacokan ji dest hilanîn dikeve, çavên xwe yên şewatperest dikutkûne û xwedanê ji ser eniya roavahiyê paqij dike..Bajarê we dizane ku mirina helbestvanan bi bîna kulîlkên bejî û bi guldankên "gulaberbero" dest bi serdana xwe

dike..

Biyanînoo...Welatê xerîbiyê kor e. Pênûsên me ên ku bi xilgên şevê hatine asêkirin, kor in. Îşev, şevê dîtir, hemî şevan hûnê bi tenha xwe, wate, digel xurîna dilopên sirûda zelûliyê, bixêrhatînen şikestî pêşkêşî neynikan bikin. (Ji xewê çeng bû. Dawiya xewnê bi hişê wî ve daliqayî ma bû. Lê mîzê dabû ser. Berê xwe da destnimêjê. Neynikê ew rawestand. Pêşî bi xwe re bişîrî, lê dawiya xewnê di bîra wî de vejiya. Çend awirên tûj avêtin xwe, eniya xwe qermiçand. Zimanê xwe derxist. carekê devê xwe ta dawî ji hevdu vekir û careke dîtir xwaro maro kir. Dihat ku xwe bixwe, lê diranên wî ên qîj nedighîştin wî.

Berê xwe da desnimêjê , lê hat bîra wî ku mîz kiriye. awirên wî ên ku li ser çermê neynikê mabûn, diherikîn, tevî mîzê dibûn..)

Rono...aniha, dê keç û xortên welatê we dest bi çînin û paleyê bikin. Dê xwendevanên we li ser sînorê zadan pêrgî hevdu bibin., ku di ber keçan re derbas dibin ji nûve li xêzên pirtûkê ên wendabûyî digerin, cigarên xwe vedixin û bi dizî li paş xwe dizivirin..

Aniha ê me ji em dê xwe ji nûçeyên we re amade bikin, em dê ji nexweşiyên re, ji sawa mirinê re û ji şewata girtîxanan û nexweşxanan re kulavên hesretê raxînin. Em, neví û dundên ve tarwêgeha bêrûmet. Em, bûnewer û aferîdeyên ve gerdûna dilhesinî, çawan xwe li ber lingên sirûda we ranemidînin, çawan em dê bikarîbin tem û ewrên giran neparêzin. Çawan em dê desthilatdariya rondikan di kezêba xwe de bi ava bendemanê nenimînin..çawan???

Nuha ez li Swêdê li bajarê Uppsalayê dijim. Ez keçeke 15 salî me. Ji sêya yek emrê min li Swêdê derbas bûye. Nuha ez diçim sinifa heştan.

Armanca nivîsa min ew e ku ez zarokeke biyanî me û dixwazim li biyaniyê hissên xwe, bi giştî aloziyên zarokan qasî ku ez dizanim, bînim zimên.

Em sê xwişk in. Ya mezin ez im. Navên xwişkên ji min piçûktir; Newroz, Yekbûn û navê birayê min Biyan e.

Em ji Kurdistana Bakûr ji bajarê Nuseybîne ne. Berê 12'ê Îlonê bavê min jî bi fikrên welatparêzî cihê xwe di nav tevgara "Rizgarî" de digirt û xebata xwe didomand. Dayika min jina mala ye û ji eynî bajarî ye.

Wexta ku ez tîm dinyayê bavê min, navê min dike Bêkes. Di wê demê de camêro ez mahkûmî bêkesiyê kiribûm. Lê xwezî wî em li welatê me bêkes hîştiba û ne li biyanîyê. Li biyanîyê bêkesî gelek zahmettir e.

Wexta ku Cunta eskerî li Tir-

kiyê hat ser hukum, li bavê min jî geriyên ku wî bigrin. Lê wî xwe neda dest û derbasî Kurdistana Sûriyê û jî wê jî derbasî Swêdê bû. Piştî wextekî em jî anîn Swêdê.

Lê mixabin derketina derve û bi taybetî jiyana li Swêdê gelek guhartin di jiyana me de û bi taybetî li ser fikrên bavê min kir. Ew êdî roj bi roj ji rêxistinanan û fikrên Kurdistani bi dûr ket.. Û dawiyê jî wî dev ji me 3 xwişk û birakî me û jî dayika me berda.

Ez bawer dikim ev problema ha bi giştî problema civaka me ye. Ez baş dizanim ku gelek malbatên din jî di vê rewşê de ne. Gelek zarok û xortên me di bin aloziyên wiha de dijîn. Lê pêwîst e ku rewşenbîr û bisporên me li ser vê rewşa ha baş rawestin. Rêxistinên me yî li Swêdê wek komelê û

Federasyona me li ser sebebên ve rewşê rawestin...

Da ku em zaroyên bê bav dimînin xwe di civaka biyanî de wenda nekin û her Kurd bimînin.

Daxwaz dikim ku ew mesela bête munaqeskirin û kovar, rojnâmên me cîh bidin me jî.

Bavê min jî her çend 17 salan bi dayika min re zewicî ma jî her tim di mêjiyê wî de yeke biyanî bîne hebûye û di taliye de wiha kir.

Berî ku ew bi dayika min re bizewice dayika min baş nas dikir. Wî dizanî ku çend pêşketî an paşketî ye.. Wî hemû alî qebûl kirin û zewicî. Lê piştî hatina Swêdê tu bibêji nebêji, Swêd civateke pêşketî ye. Em çî bikin jî em nikarin di çend rojan an mehnan de bibin wek Swêdiyan- lê wer xwiya ye ku camêrê bavê

Koletiya mêrê Kurd

Bêkes Alp

min ji dayika min ew dixwest ku çima ew ne wek Swêdiya ye.

Me gelek car bihiştîye û dîtîye ku, zilamên me wexta bi jinên Swêdî re dimînin, ew jî xwe dikin wek Swêdiyan. Li ber wan dibin pepûk. Xizmeta malê dibe karê wan ê rojane. Lê wexta bi jina Kurd re zewicî bin dibin axa. Destê xwe nadin tiştêkî. Wek koleya li jinên xwe dinerin..

Çima gelo hûn dixwazin di jinan de guhartin çêbibe û bibin wek Swêdiyan û çima guhartinê di xwe de çênakin. Çima ew jî nabînin wek Swêdiyan li hember jinên xwe..

Em bibêjin ku dayika min paşketî ye, nezan e, ma gelo kesên paşketî û zana di nav Kurdan de nemanê ku yên ku jinên xwe berdidin bêtîrê wan diçin biyaniyan re dimînin.. Bavê min tew çûye ji Romanyayê ji xwe re yek

anîye..

Belê bi kurtasi ev problema min bahs kir, problema gelek malbatên Kurdan e. Wek min got bi taybetî pêwîst e rexistinên me bi her awayî li ser vê rewşê rawestin. Divê civaka me neheqiyên ku zilam li jinê dike qebûl neke û van kesa baş binase. Ger ku bi rastî zilam neheq be, pêwîst e civak wan ji xwe dûr bixe, ku kesên din jê cesaret negre û bê sual, bê sebeb zarokên din wekî min bêkes nehêle. Dayikên me hustu xwar nemînin. Civaka me ya malbatî ji hev nekeve.. Lê mixabin ez eksê vî tiştî wexta dibînim ez gelek aciz dibim.. Wexta bavê min keça Romenî ani û ji civakê dûr ket ku xwest dîsa xwe nêz bike, çu xwe di refê rexistina xwe ya ku bi salan jê dûr bubû, girt. Hevalên wî ji bo pîrozkirina jina wî ya nu jê re şahî çêkirin. Ev yeka ha rûşeyîyeke mezin e.

Lê ez baş dizanim tekoşîna bavê min ya îro bes ji bona jina wî ya Romenî û firotina pîrr pîzzayê.. Ji xebata wan re serfirazî....

Kultur û Qabiliyet

Riza Polat

Bi hezaran sal in dawîya munaqêşên di ilmên civakî de nehatîye. Ji ber ku ilmên civakî ne wekî ilmên tabîî ne. Di ilmên civakî de formul, qalib, şablon nayên kar anin û tunene. Her filozofek yan jî her alimek li gor zanin û kapasita xwe, jîyana mirov û jîyana civakê izah kiriye û teorîyek çêkiriye. Pir caran piştî demekê, alime kî din kêr û kasiyên teoriya wî dane xuya kirin û di wî warî de munaqêşên nuh vekirine.

Lê belê di ilmên pozîtîf de rewş ne wiha ye. Di van ilman de qanun hene û her qanunek jî xwedî şablon, formul û qaliban e.

Têkilhewî û aloziya ilmên civakî pir in. Felsefe, sosyoloji û tarîx ji her alî de, her tim hatine munaqêşe kirin û dawîya munaqêşan ne hatîye.

Em ê jî li quncikê "kultur û Qabiliyetê" de li gor zanin û kapasita xwe hinek ji van pirsan binin ziman.

Di derheqê xwe û dinya xwe de têgihîştina mirov

Di bingeha her reket û fikirandina mirov de, hisên di derheqê dinya mirov a hundirîn û ya derveyî de qonaxên fêmkirinê hene. Eynî his li cem du mirovan cuda tê fêmkirin û têgihîştinê cuda diafirîne.

Hiskirina mirov ji organên hisker ên cuda cuda û hiskirinê cihê cihê dest pê dike. Piştî demeke pirr kurt hisên mirov digihîjinn merhela fêmkirin û têgihîştinê. Di şertên normal de mirov bi vî bîstika kurt nahese.

Hiskirina organên mirov ên hisker, cuda cuda ne û her yek bi tiştekî his dike û dişîne mējûyê mirov. Wek mîsal; germîsarî, şirînîşorî, mezinbiçûk, reş û sipî, ji vana her yek bi riya organeke cuda digihîje mējûyê mirov û bi organên hiskerên cuda cuda tîndarîndin. Lê yek merkeza têgihîştinê heye.

Merkeza têgihîştinê, hisên ku gehîştinê xwe bi hev re diafirîne. Lê ji bo merkeza fêmkirinê, dikare yek ji yeka din muhîmtir be. Di qonaxa têgihîştinê de rola tecrube û jîyana mirov pirr girîng e. Di vî qonaxê de mējû, rewşa mirov a civakî û kulturî jî dihesibîne û sentezekê çêdike. Di dema berî merhela sentezê de mējûyê mirov hinek hisên ku organên hisker şandine hildibijirê. Hineka dide aliyekî, yan jî hinek valatî û kêmasiyan dadigire û maneyekê dide daxwazên mirov.

Hisên ku organên hisker dişinin mējû pirr basî in. Lê têgihîştin û fêmkirin pirr têkilhev û zehmet e. Çûnkî di merhela fêmkirinê de zanîn û tecrûbên mirov jî roleke esasi dilîzin. Ji ber vî yekê eynî hisên ku diçin mējûyên du mir-

rovên cuda, têgihîştin û izahkirina van hisan ji bo her yekî cihê ye.

Her hediseyeke têgihîştinê, li ser esasên hisên ku hatinê mējû rû dide û teorîyek teşkil dibe. Di vî merhelê de ev teorî ji bo tehqîqkirin û tecrûbayan vekiriye û nezeriyeke muweqet e. Çûnkî hisên ku dîr e tîndarîndinê ve teorîyê xurt û bi qewet ji bikin, an jî zeif bikin û biguherînin.

Her mirovek nezerîya têgihîştina xwe, di çerçewa jîyan û serpehatiyên xwe de çêdike. Têgihîştin merheleyeke pirr spesîfîk e. Tiştên ku mirov diafirîne, her fikrek û her livek di merhela têgihîştina xwe de derbas dibe û şêkil digre.

Di têgihîştinê de du qonaxên bingehîn hene. A yekem diqatkirin ji bo hilbijartinê ya duyem jî ji bo idarekirina ku tiştên gihîştinê mējû. Organên mirov ên hisker bi nisbeteke pirr hedîseyên ku li derve yî me dibin, qeyd dikin. Lê mirov, hedîsên ku li der û dora wî diqewime di dawîya hilbijartinê de têdigihîje.

Ji ber vî yekê jî mirov an-cak qismekî ji hedîsên ku organên hisker qeyd dikin fêmkirî dibe. Wek mîsal; mirov dema dixwîne, dinivîsîne, yan jî proplemeke matamatîkî çêdike, bi pirr hedîsên ku li der û dora mirov çêdibin, pê nahese. Lê dema ku mirov qelem an jî pirtûka xwe deyne û çavê xwe bigre û guh bide dinyayê, mirov bi hinek deng û livên nuh dihesê. Ji ber ku mējûyê mirov nikare hisên ku bi milyara tîne mējû di eynî wextê de fêmkirî bike. Ji ber vî sedemê jî hedîsa hilbijartinê xususiyeteke têgihîştinê a

esasi ye.

Di hilbijartinê fêmkirinê de tesîra hinek hisan pirr e. Hisên ku derveyî û yên ku bi wî ve girêdayî, hisên esasi ne. Hisên ku derve ên ku bi riya hiskerên me gihîştinê mējûyê me bi hinek xususiyeta bala mirov dikşinin. Wek mezinayî, giranî û guherînî. Daxwaziya mirov, baweriyên mirov ên dîni û ên din, mustewa xwendin û zanîna mirov, krîterên ku mirov di her tiştên cuda da bi kartîne, cinsiyeta mirov bi hisên şexsî ve girêdayîne.

Têgihîştin di eynî wextê de organîzasyon e jî. Organên hisker, hisên ku dişîne mējû ne bi ser û ber in, ne bi nîzam û bi teşkilat in. Hisên ku digihîjin mējû tîndarîndinê û bi maneyekê rû dide. Mirov maneyeke mezintir dide hisên ku li cem mirov kom dibin.

Çûnkî maneya ku em didin hisên ku gihîştinê me li ser bingeha zanîn û kûrbûna mirov e, ev dikare mezintir an jî biçûktir bibe, zelaltir û şêlûtir bibe.

Têgihîştin çawan dibe? Mirov tiştekî tam nebîhîze an jî baş nebîne, fêmkirin wekî mirov ev tişt tam bihîstibe an jî baş dîtibe tam fêmkirî dibe. Mirov kêr caran tiştekî tevayî dibîne an jî tevayî dibihîze, lê mirov maneyeke tam dide wê. Maneya mirov dide hediseyekê li gor bunya mirov, zanîn terbiye, mezin û biçûkayiya mirove.



Weşanên Nuh



Roger Lescot, Çiyayê Kurmenc û Tevgera Murûdan, Weşanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê, 80 rûpel, Stokholm, 1993

Roger Lescot alimekî Fransîz, dostê Kurdan bû. Ew di pirtûka xwe de li ser dîrok û civaka Çiyayê Kurmenc dişîne û bahsa êşirên ku di vî herêmê de hene û gundên wan, dike. Eşîr ev in. Şî-kakan, Amkan, Biyan, Şêxan, Cûmiyan, Rûbarîyan, Xerzan, Heştîyan û Xastiyan

Roger Lescot

Çiyayê Kurmenc û Tevgera Murûdan

Weşanên Komela Jinên Kurdistanê li Swêdê

Pirtûk ji van beşan pêk tê:

Nexşa Çiyayê Kurmenc a- Hatîndê Çiyayê Kurmenc, b- Şênbûna Çiyayê Kurmenc, c- Dîroka Çiyayê Kurmenc

Durvêd siyasî yê Çiyayê Kurmenc, a- Bingehê siyasî yê Çiyayê Kurmenc, b- Pîrsa olî, c- Pîrsa civakî, **Destpêka Murûditiyê li Çiyayê Kurmenc**, a- Kokên Murûditiyê, b- Dûrvêd olî yê Murûditiyê, Murûditiyê û pîrsa civakî, **Durvê siyasî yê Murûditiyê**, a- Murûditiyê û siyaseta deverin, b- Peywendiyên Murûdan bi Tirkan re.

MÊR MÊRA NASDIKE!



Mamoste, Mêr Mêra nas dike, Weşanên Jîna Nû, 100 rûpel, Stokholm, 1993

Ev kitêba duyemîn ya karîkaturên Mamoste ye. Kitêba berê di 1984'an de bi navê "Dengê Xezikan" hatibû çapkirin.

Di vî Mamoste de 100 karîkatur çî digrin. Mamoste bi karîkaturên xwe rewşa Kurdan û siyaseta Tirkîyê li hember Kurdan tîndarîndin.

Pêşgotina kitêbê ji aliyê Mûrad Ciwan ve hatiye nivîsandin. M. Ciwan di pêşgotinê de wiha dibêje: "Mamoste karîkaturîstekî Kurdê wiha ye û di rewşeka

dijwar a bêdezegeh û bêmkaniya miletê Kurd de, piştî salên hefteyî bi huwiyeta xwe ya Kurdîtiyê derketiye, qelem û firça xwe ji bo daw û doz û êşa gelê Kurd livandiye..."

Ehmed Huseynî, Bi xewna we pênûsê dilorînim, Weşanên Jîna Nû, 120 rûpel, Stokholm, 1993

Ew dîwana Ehmed Huseynî ya duyem e. Dîwana wî ya yekem "Mîstek ji şîna bêcîr" di sala 1990'ê de çap bû.

E. Huseynî helbestên xwe yên ku di navbera 1984-1992'an de nivîsîne di vî pirtûkê de çap kirine. Helbestên wî ji van sê beşan pêk tê: Pirtûka Kewê Bêzar, Awazên Rono û Nav û Dabeşkirina Xewnên Hîroyê. 33 helbest di vî dîwanê de çî digrin.



Zeynelabîdîn Zinar, Siyabend û Xecê, Pencînar Weşanxanaya Çanda Kurdî, 160 rûpel, Stokholm, 1992

Destana Siyabend û Xecê di folklorê Kurdî de ciyekî girîng girtiye. Nivîskarê Kitêbê di pêşgotinê de dibêje: "Mixabin heta nuha dema jiyana Siyabend û serpehatiyên wî bi awakî sererast nehatine nivîsandin. Îcar min ew serpehatî li gor destdayînên xwe, bê ku tarîxa jiyana wî zanibim nivîsî..."



Lêşik Cengel, Kurdyjski-Girêka. Weşanxana Universitas 446 rûpel, Krakov 1992.

Ev cara yekemîn e ku li ser dîrok û civata Kurdan pirtûkek bi zimanê Polonî, li Polonyayê tê weşandin.

Di salên 1977-1978 an de, nivîskarê pirtûkê digel grupeke pisporên Polonî çûye Kurdîstana Îraqê di warê daristanî de li ser 80 gundên Kurdîstanê lêkolînen xwe yî zanîyarî çêkirine. Encama çûna wî bo Kurdîstanê ev pirtûk e. Lêşik Cengel li bajarê Krakovê endamê sazûmankerên Komela Biratiya Polonî û Kurdan e.

Pirtûkê çiqasî ku politîkî ye ev qas jî civakî û kulturî ye.

Amadekar: Robîn M.

MEMÊ GERGERÎ Û KAL MUSÊYÊ ZEYDAN

MALMÎSANIJ

Çiyê ki ez tiya (ewta) derheqê hedîsey Memê Gergerî û Kal Mûsê di nusena pîy mi mi rê vatî. Yê senêhewa vatî mi ayhewa nuştî. Pîy mi no hedîse pîy xwi ra, yanî bawkalê mi ra eşnawito. Bawkalê mi zî pîy xwi ra, yanî bawkalê pîy mi ra eşnawito. Qeydê nufusî gore pîy mi 1899 di marda xwi ra biyo. Nay gore, mêrdim şîno vajo ki no hedîse 1850 ra ver biyo. Beno ki 1800 ra zî ver biyo, fek bi fek vajiyawo û ma resawo.

Dor-marê Pîranî di her dewr di yewî hukum kerdo, pîley kerda. Mesela inê serranê peyanan di Qelbîn (1) di Haj Mehmedê Guliki vejiya, Şêxmalan (2) di Şêx 'Evdirezaq vejiya, yew deme Qelbîn di Yemoy Bekî vejiya, yew deme Dêrey (3) di Ehmedê Silêmanî vejiya, abiasan, abiasan...

Memê Gergerî zî yew mêrdim zav namedar biyo. Çewrespancas heb peyey jey, esparê jey biyo. Mem û inî peyey xwi dekewtî melmeketî miyan. Kura ki waşto zorî reydi talanê şarî berdo, çiy şarî ti ra giroto. Zor çî yo, zor? Ebi zor bê çîwa çiy şarî ti ra giroto. Ay zeman hukmatmukmat çinibiyo yan zî zaf gewşek biyo.

Mem û peyey xwi ewta geyrenî ewra geyrenî, yew rojê we-sarî yenî Dêrey. Dêrey di Bîrê Qelbînî esto (inka inî bîrî ra vanî Bîrê Dewi), Mem û imbazê xwi ay bîrî hetî ronanî. Deştê Dêreya gonari û ay mergî weşbê jînî şona, owra ronanî. De yew nehewtano qarişê jînî bo, o yû imbazê xwi zordar î, "mêrdimwer" î. Kura ki waşt owra ronanî. Ay wextan Qelbîn zav biyo, Zeydan (4) zî zav biyo labrê Dêrey di çend hebî keyey tena bîy, Dêrey tikêkî biya.

Ay wextan Zeydan di yew camêrd biyo, namey jey Kal Musê biyo. Namey cenîya Kal Musê zî Taji biya û Taji zav rindi biya.



Key Kal Musêyînî verna Zeydan di heway axayan î, axa hesabiyênî.

Rojî Taji xwi rî yena Dêrey, Bîrê Dewi ser. Yena ki pey kindan aw bero. Verî Qel-bîn û Zeydan di aw çinêbî, ne eyne bi ne zî bîr bi; him Qelbînîjî him zî Zeydanîjî hameynî Dêrey ra, Bîrê Dewi ra pey kindan aw berdînî. Memê Gergerî, Bîrê Dewi ser o Taji veyneno, şono ti ra vano:

-Zerra mi to rî esta, ez qayîl a ki ti ewta mi hetî mana.

Taji vano: -Inawa beno? Ez weerê gedan û keyî ya.

Mem ti ra fek verra nêdano. La Taji zî aqlî ya, kona ya, hewnêna ki Memî dest ra nêxelîsêna, vano:

-Madem ki ina wo, balê ez eyro şêra keye, de ez timo yena aw. Siba-disibay ez hewna yena, ma veynî ma se kenî.

* * *

Taji ki şona keye, bermena, çizzena. Kal Musê vano:

-Pitê qey ti bermena?

Kal Musêwo feqîr çî zano ki Rom hamewo Dêrey. Ti ra vatî "Rom", "Rom" ki yanî endihey zulimkar o.

Vana: -Ez çî nêberma? Û haal-hewal mesila Memî û xwi Kal Musê rî vano.

Kal Musê zav hêrs beno labrê nêdano teber, vano:

-Çî nêbeno, Hûmay pîl o, dîna hera ya.

Gamî ra pey zî wardeno ya Ella estora xwi wenîşeno.

Taji vano: Keço, ti se kenî?

Vano: -Ez şona Diyerbekir (Diyarbakir)?

Vana: -Qey leza to û Diyarbekir a? Ti şonî Diyerbekir se kî?

De Kal Musê zî tanî niyo, peyanê Zeydan û Qelbînî miyan di namedar o, şad û şudê jey estî. Vanî ay zeman rimî bî, esparan pey riman yewnan kiştîni.

Mi bi xwi rim nêdiyo, hewawo ki vanî, seno se xiştî, yew çiyê têtî û derg o, esparî estoran ser ra ver yewnan danî. Kamî ki bigino, quli keno, kişeno.

Kal Musê Taji ra vano: -Ez şona Diyerbekir ra xwi rî yew rim ana. Ti zî şo Dêrey, eke Mem gilana hame, ti ra vaji "Mêrdey mi esto, qey la gurey inasarênî qe-bul keno? Key ki hame şima ko gozanê xwi bari kî. Eki ti jey ra hewlêr bî, to zorê jey berd ti ko mi bigîrî, nêki xwi ra ti nişnî mi bigîrî."

Kal Musê dano piro şono Diyerbekir, Taji zî şona Dêrey. Taji ki şona Mem yeno vernî, vano:

-A qala ki ma kerdîbî, se bî? Taji vano: -Ez weerê mêrdî ya,

qey mêrdey mi qe-bul keno ki ti mi bigîrî? Eki ti jey ra hewlêr bî, to zorê jey berd ay wext ti ko mi bigîrî.

Mem vano: -Mêrdey to kure wo? De wa bêro!

A vano: -Inka keye di niyo, ko bêro.

Mem vano: -Keye di niyo, kura şiyoy?

A vano: -Şiyoy Diyerbekir?

Mem vano: -Çî şiyoy Diyerbe-

kir? A vano: -Şiyoy Diyerbekir ra Çarî rê ano nalan, Taji rî ano hinçaran. Meraq meki şima ko yewnan veynî.

Çarî, estora kal Musê biya. Hinca-rey zî verî biy, cenîyan dekerdîni destanê xwi, sêmênî û zerrênî bîy; destanê cenîyan di xirr-xirr kerdîni, ti ra veng vejeynî.

Mem vano: -Inawa bibo mesila asan a.

Yew-di rojî ra pey Kal Musê yeno ki rimê jey jey dest d' o û espar o. Şono Dêrey, Memî û mêrdimanê jey ra vano:

-De xwi bêrî ma veynî! Eyro rojê camêrdan o, ma şerr kenî!

Ê û Kal Musê danî pêro, danî pêro, Kal Musê bêxeyja şes tenan jînî hemînî kişeno. Ay mêrdimanê Memê Gergerî ra şes tenî tena ganî manenî û rem-nî xelisênî; ay bîni kişênî. Mem zî kişeno. Kal Musê wesêneno Zeydanîyan ser, yenî, ay meytan hemînî Pîmsur (5) di wedarênî.

Ay cawo ki inî mêrdimî nimîti, herê rojawanê Pîmsurî di wo. Daranê weyray ra Dêreyîjî hima zî vanî "Darê Xerîban" (Dara xerîbi). Ay kiştêy xerîbî bî, cûka ti ra vanî "Darê Xerîban".

* * *

Ma bêrî lajanê Memî ser. Di lajê Memî benî, yew pîze di marda xwi ra benî, dileti benî. Zeman te de şono lajê jey pîl benî. Wexto ki pîl benî, persenî vanî:

-Pîy ma kure wo? Maya jînî dey rî mesila vano.

Bander benî ki pîy jînî senêwa kişiyawo û kamî kiştî. Vanî "Leyrekê maran bê ja'r nebenî", inî wîrdî lajêki wardenî tanî cilanê keyenan xwi ra danî, wiryew xwi rî yew qama peyda kenî, yew manîki (6) binê çengê xwi nanî û seki parse biki geyrenî. Çarnenî, çarnenî, yenî hetanî Zeydan û şonî key Kal Musê.

Kal Musê vano: -Şima çî yî, çikare yî?

Vanî: -Ma xwi rî rencber î, ma feqîr î, ma wazenî bixebitî.

Kal Musê a şew nan dano bere, jînî hewêneno. Labrê wîrdî lajê Memê Gergerî ortey şewi di wardenî, ramenî Kal Musê ser, jey finenî kardiyen fek, kişenî û teber kwenî, gilana şonî key xwi.

TORNÊ KAL MUSÊ Û "QORUÇIYÊY"

Ay Zeydanîjo ki yew-di serrî ra ver biray xwino pîl û birazay xwi (7) kiştî zî key Kal Musê ra bi, tormanê jey ra bi.

Biray jeyo pîl desta hukmatî bi, cûka mabênê jey û hukmatî weş bi. Zeydanîyan ra heşt-new tenî bibî qoruçî (8). Inî serranê peyanan di hukmatî qoruçiyey veta, me'aş û tîfing danî dewijan, vanî:

-Şima ki "inê ki teber a" (9) dîy, şima ki çeq kerd, xeberî bidî ma yan zî şima bi xwi jînî tebişî.

Hukmatî tîfing û me'aş dabi inî qoruçiyânê Zeydanîyan zî. Gurey qoruçiyân ay biray pîlî dest di bi, ey biray xwino şenik zî qoruçî nuştîbi, birawo şenik zî qoruçî bi.

Rojî ay qoruçî sax kenî ki inî [gerîllay] hanik î filan ca di. Birawo pîl vano:

-Ma biramî ser, yan zî ma xeberî bidî hukmatî wa bêro jînî tebişo.

Birawo şenik vano: -Ez gurew inasarên nêkena, inî zî ey ma yî. Ez ne ramena jînî ser ne zî xeberî dana hukmatî.

Biray jey vano: -Eki ti qarşî mi yenî û goş mi nênanî ez şona gerrey to kena, to qoruçiyey ra vejena.

Birawo şenik vano: -Perey hukmatî zav î, ez peran zî gêna ez xeberî zî nêdana hukmatî. Ino hukmat xwi ra hukmatê ma niyo.

Birawo pîl vano: -Madem ki ina ya, ez şona qereqol ra vano, wa me'aşê to bibirmî, tîfingê xwi to ra bigîrî, to qoruçiyey ra vejî.

Dim a raştê gerrey biray şenikî qereqol di keno. Aya ser ra Başçawuş zî tîfingê lajêki ti ra gêno, me'aşê jey birmenî.

Birawo şenik semedê aya ra hêrs beno, vano "Cay mi puştêy nêkerda ki ti şarî miyan di gerrey mi kenî. Ez zî inay to rî nêverdana." Keye ra şesdarbê (dabançey) xwi gêno, şono vernîya biray xwi û qoruçiyân di, rarê jînî ser o vindeno. Dolmîşî ki yena, biray jey û qoruçiyê bîni te de benî, birawo şenik pa nano, biray xwinê pîlî, birazay xwi û yewna Zeydanîjî yanî hîrê tenan pê ser o kişeno. Dima şesdarbê xwi gêno şono key muxtarê Dêrey Ekremî. Ekremî ra vano hal-hewal mi ina kerdo, xeberî bidî qereqolî, ez teslîm bena.

Key Ekremî di teyl esto, Ekrem teyl keno, qereqol ra cendir-mey yenî, jey tebişenî benî.

Tornê Kal Musê zî ina kerd.

Jacques Prévert'î ra çend şîrî

SEMEDÊ TO RA WAŞTA MÎ

Ez şiya bazarê milçikan
Û mi milçikî erînay
Semedê to ra waştâ mi
Ez şiya bazarê vilikan
Û mi vilikî erînay
Semedê to ra waştâ mi
Ez şiya bazarê asingazî
Û mi rêzilî erînay
Rêzilê giranî
Semedê to ra waştâ mi
Û dim a ez şiya bazarê hêşiran
Ez to geyraya
La mi ti nêdiya waştâ mi

ARÎYA NİMAJÎ

Yê qehwe dekerd
Miyanê fîncanî
Şit dekerd
Miyanê fîncana qehwî
Şeker devist
Miyanê qehwey şitînî
Pey kewçîka wîrdêki
Tê da
Qehwewo şitîn şimit
Û fîncana xwi ronay
Bê ki mi di qalî biko
Yew cixara
Pa nay
Duman ra
Helqey vay day
Weli xwi dekerdî
Miyanê welidankî**
Bê ki mi di qalî biko
Bê ki mi ra biewniyo
Werîşt

Şewqa xwi
Xwi ser nay
Pardesuyê xwi yê varanî
Xwi ra da
Çînkî varan varaynî
Û şî binê varanî di
Bê ki vajor bibo
Bê ki mi ra biewniyo
Û mi
Mi ebi destê xwi serey xwi tepîşt
Û ez bermaya.
*nimaj: serê sibay, sodir
**welidankî: tebaxa ki mêrdim cixara weli dekeno

Frensizkî ra tadayox:
Bengin ROŞN

Dîsa şer dest pê kir

û got dema şerwestandinê kuta bû, divê ku texrîbatên li Kurdistanê bîn sekinandin yan na wê li Tirkîyê jî texrîbat dest pê bibe.

Ocalan axaftina xwe weha dom kir.; Şerwestandina yekalî îro xelas dibe, ev yek dixwaze bila ji alî terefek an herdû terefan be, rawestandina şer hukmê xwe wenda kiriye û li şûna wê şerekî dijwar dest pê kiriye. Ev tişt him ji bo me, him ji bo dewletê û him jî ji bo gelan dijwar e. Lê li hember vê bêçaremayî ne karê min e, ev karê dewletê ye. Dewlet naxwaze doza Kurdan çareser bike. Ciddiyet û girîngiya vê dozê li ortê ye. Lê dewlet naxwaze vê bibîne."

Li ser bûyera Çewligê hêz û partiyên din yên Kurdistanê Bakur jî bi beyanan helwêstên xwe nîşan dan û gotin ku dewletê bûyera Çewligê ji xwe re kir behane.

Komîta Merkezî ya YEKBÛN'ê di 10'ê Heziranê de beyanek derxist. Beyan li ser bûyera Çewligê, li ser yekalî şerwestandinê û li ser protokola ku di navbera PKK û PSK'ê de îmze bûye disekine û weha dibêje; "Dewleta Tirk çiqas bixwaze bûyera Çewligê bike hoy û êrişê xwe ya ser gel bi heq derxîne jî ev tişt rastiye nagehurîne. Rastî ew e ku herçî bûyera Çewligê li gor wext û wek metod bûyereke ne di cî de be jî û çênebûna jî, dewletê dê operasyona xwe her dom bikirana."

Beyana PSK'ê ku di 9'ê Heziranê de belav bû, li ser bûyera Çewligê wiha dibêje; "Di bûyera Bingolê de xeta û qusûrên PKK'ê çî dibin bila bibin, dewleta Tirk tu carî aşî nexwestiye. Riya aşî û diyalogê dewleta Tirk girtiye."

Hevgirtin-PDK piştî bûyera Çewligê bi îmza Seroktiya Giştî belavokek derxist. Di belavokê de li ser bûyera

Çewligê bi kurtî wêha tête gotin; "Dewleta Tirk bi kirinên xwe astengî derxistin ku mesela Kurd bi riyên aşî çareser nebe. Politîkaya dewletê ya şiddetê bû sebeb ku li ser riya Elezîz-Çewligê 33 leşker û hinek kesên sivil bîn kuştin û birîndar kirin."

Bê tahlihiye ku bûyera Çewligê di dema yekalî şerwestandinê PKK'ê de ji aliyê gerillayên PKK'ê ve hat çekirin. Ev bûyer di di raya giştî ya cihanê de tesîrek negatîf kir.

Amnesty dibêje divê Tirkiye Beyana Cewlêrê qebûl bike û PKK jî divê li gor qanûnên şer hereket bike eskerên ku teslîm digre nekuje, bi wan muamela esîrtiyê bike.

◆Wexta rojnama me ket çapê alîgirên PKK'ê bal-yozxanên Tirkîyê ya Muni-hê(Almanya), ya Marsilyayê(Fransa), ya Bern û Zurichê (Swîsre) îşgal kirin û Buruya Şirketa Tiyara ya Tirkîyê ya Stohkomê jî dan ber kevîran.

Lewend Firat

Serokê DEP'ê Yaşar Kaya....

Destpêk: r. 3

Yaşar Kaya berî çendekê Kurdistanê Başûr ziyaret kiribû. Me jê pirsî ku gera te çî tesîr lê te kir. Rojnâmeya ku tu xwediyê wê yî di derheqa rûdanên li başûrê welatê me helwesteke pîr negatîf wergirtibû û nivîsên negatîf çap dikirin. Li başûrê welet ew tiştên ku we rexne lê digirt hatin guhertin an jî hun bi xwe hatin guhartin li xwe haybûn ku ew helwesta we ya li hember pêvajoya ku li başûrê Kurdistanê ne di cî de bû?

Yaşar Kaya samîmî got yan na, lê axaftina wî zelal bû û wiha digot; "xewna min bû ku ez herim Kurdistanê Başûr. Çunkî li gor min, Kurdistanê azad bû. Ez herim Kurdistanê azad bi çavên xwe bibînim, fikra min dilxwaziya min ev bû. Em mêvanên Kemal Fûad bûn. Yekitiyê gazî me kiribû. Ji bo min, di jiyana min de gelek demeke xweş bû me welatê xwe yê perçeyê azad bi çavên xwe dît. Em çûn parlamena Kurdistanê em çûne. Silêmaniye, em çûn Dihokê em

çûn Laleşê. Me gelek cihên Kurdistanê dît. Em kêfxweş bûn. Mebest ew bû ku em fam bikin ka wê Kurdistanê bakur û başûr çawa ji hev hez dikin. Çawa nêzîkî hev bin çawa bibine yek, çawa herin bîn, em vê riyê çawa dikarin vekin? Mazubaniyê baş nîşanî me dan.

Li Kurdistanê Başûr jî em li ser vê meselê peyîvîn. Hevalê me yê delal Ahmed Bamernî ji rojnâme Welat hevalê me ji Mazhar re got; Kekê Mazhar me manşetên we gelek dît. Hûn dibêjin vana koleyên Emerîka ne. We hat dît. Wisa ne an ne wisa ne? Tabî ev birayê me zehf genc e "tecrubesiz"e. Ez ketim milê Ahmed Bamernî, min jê re got "bira hinek Kurdan birayên xwe kuştin em ji wan re dibêjin birakuj, hinek Kurd jî rûniştin ji bo birayên xwe gelek tiştên nebaş nivîsandin. Lê te gava din li salonê tiştê baş got. "Te got me ev rûpel girtin" Ez jî bawer dikim ku li Kurdistanê ev rûpel hatin girtin. Ez bibêjim ev îsal 30

sal in ku ez biratiyê dixwazim, ev wusa ye. Ev birati xwestina min e, ev nivîsanên çewt yên din ku di "Gundem"ê de derketine ji ortê ranake. Ez dikarim ewqasî bibêjim, ronameya rojane mîna çemê mezin e. Tu nikarî wî çemî hemûyê himbêz bikî. Îro 3-4 roj in ku ji bo partiyê min dev jî nivîsandinê berdaye. Ez êdî nanivîsinim.

Hevalekî me jî bi me re bû. Kekê Abdurrahman. Wî jî got: "Kekê Ahmed hinek ji Başûr derketin ser tankên dewleta Romê lê gotin bira bijî TC. Em jî hesabê wêya napirsîn". Ev jî gotina kekê Abdurrahman bû. Paşê min êvarî li otelê jê re got "Kekê tu kekê me yî. Tu dîndar î, tu ji medreseyê tê gelek hurmeta me ji te re heye. Got "Canim, tiştek nabe em birayên hev in, çewtiya wan jî bû, ya me jî bû. Me ew rûpel girtin" Ez jî bawer dikim li Kurdistanê, ev rûpel hatin girtin.

Reportaj:

Faris Can & Mustafa Aydoğan

Bi şablona hemberî...

Destpêk: r.4

rasyonê diparêzin, bersivên problemên siyaseta aborî nadin. Bila mînaka me Kurdistanê Başûr be. Em ferz bikin, Ereben Sunnî û Ereben Şîî bi Iraqê federal razîbûn û Seddam nema. Gelo Federasyona Kurdistanê Başûr wê kîjan siyaseta finansê û faîzê pêk bîne? Bûtça xwe, baca xwe çawa diyar bikin? Wê siyaseta xwe ya ji bo hinek sektorên aborî çawa tayin bikin? Problemên eksportê û împortê wê çawa çareser bikin? Federasyona Kurdistanê nikare bi serê xwe bersiva van pirsan bide. Aliyek tenê nikare siyaseta xwe ya aborî tesbît bike û tatbîq bike. Lê dewletek serbixwe, ew bi serê xwe, siyaseta xwe ya aborî tesbît dibe û tatbîq dibe.

Ji bo vê yekê stratejiya me ya siyasî, wê bi xwe re alternatîfên siyaseta aborî jî bîne. Siyaseta aborî problema îqtîdarê ye. Ku mirov ne li îqtîdarê be, mirov nikare siyaseta aborî ya dewletekê tesbît û tatbîq bike, lê mirov dikare siyaseta aborî biparêze. Ji bo mirov siyaseta aborî biparêze jî divê stratejiya meriv diyar be.

Na, ku stratejiya me wê serxwebûna Kurdistanê be, wê demê nivîskar çiqas liberal be bila liberal be, wê destpêka sazîna dewleta Kurdistanê û avakirina aboriya Kurd ji bo serlingên xwe bimîne, wê MD di giraniyê de be. Dewlet wê hemû quweta xwe ya aborî organîze bike, merkezi bike. Ew jî plan e. Gava Kurdistan xelas bibe, wê febrîqên kolonyalîsta ji dewletê re û ji belediya re

bimîne. Çiflikên dewletên kolonyalîst wê bibin çiflikên dewleta Kurd. Erdê xayinan û biyaniyan ku bi zorê erdê me kirine malê xwe, dewleta Kurdî, wê wî erdî ji wan bistîne. Banqe û şirketên Tirkîyê wê ji dewleta Kurdî re bimînin. Petrol, hesin û hwd. wê ji dewleta Kurd re bin. Ev tişt quwetên aborî ne, dibe ew organîze bibin. Ev merhela pêşiyê ye û siyaseta aborî ya merhela pêşiyê ye. Lê wê xwedaniya Ferdî, xwedaniya biyanî û hwd. wê li Kurdistanê hebe.

Piştî aboriya Kurdistanê li ser lingên xwe rûnê, mekanîzmên aboriya wê ava bibin. Di merhela duyem de, wê kîjan siyaseta aborî tesbît bike û tatbîq bike, meriv nizane. Ev bi quwetên siyasî ve girêdayî ye. Kî li îktîdarê be ewê siyaseta aborî ya Kurdistanê tayin bike û tatbîq bike. Siyaseta aborî bi balkêşiya çînen civakî ve girêdayî ye. Divê em bizanibin ku li Kurdistanê çî hene, wê siyaseta wan ya aborî jî cûda be. Kurd hemû ne çînek in, wê tenê siyasetek aborî jî tune be, wê gelek hebe.

Ez naxwazim şablonek her dem biparêzim. Lê di merhela pêşiyê de ya xelasbûna Kurdistanê serbixwe de SAMP û MD diparêzim. Lê MF û şiklên xwedaniyên din înkâr nakim. Ji bo reqabeta aborî hebe, divê pîr şiklên xwedaniyê hebin. Monopolîyê naxwazim, refehê gelê Kurd diparêzim. Li Gor baweriya min aborî ne ji bo aboriyê ye, aborî ji bo mirovayetiye ye.

◆

DEP kopiya HEP'ê ye

Destpêk: r.5

Armanc: Piştî demekê partiyekê nuh bi navê Partiya Demokrasîyê (DEP) hat avakirin û hûn jî di destpêkê de di nav vê hewldanê de bûn û we di nav civîna damezrandinê de cih girt. Piştê we civînê terk kir û we da xuyakirin ku hun jî îro pê ve mesuliyeta wan dan û standina li ser xwe qebûl nakin. Daxwaz ji DEP'ê çî bû. DEP bi vê pozîsyona xwe bersivê daxwaz û hêviyan dide? Sebeb çî bû ku we di DEP'ê de cih negirt?

Elçî: Ev partiya nuh ji bo ihtiyaciyeke bû. Eger HEP wezîfa xwe ya partiyekê legal bianîna cî, ji yekê din re pêwîstî nebû. HEP iyan bi xwe jî got siyaseta me nameşe, lazîm e siyaseteke fireh û bi tarzê demokratîk gelê Kurd hemû li cihek top bike, partiyek wilo pêwîst e. Ji bo vê armancê em li hev civiyan, me got emê partiyekê demokratîk û li rîya aşîyê tekoşîna gelê Kurd bi-meşîne û çî kesê netewî bin, we latparêz bin, cihê wan di nav pde hebe ava bikin. HEPiyan ew di serî de qebûl kirin. Lê mixabin piştî civînê me dît ku zihniyeta HEPiyan nehatiye guhertin. Di bin hawayê yekitiya ku di nav hêzên Kurdan de digeriya îstîfade kirin. Hinek insan anîn, kirin hevalên xwe û carek din xwestin di siyaseta de ew li ser lingan bimînin. Dîsa ew

li ser lingan bimînin, insanên ji derveyî wan bibin alîkar. Min dît di vî siyaseta de menfeata gelê Kurd nîne, zihniyeta nehatiye guhertin, kadroyên wan kadroyên berê ne û millet ne

mumkun e ji wan kadroyan bawer bike. Ji bo vî jî min tu xêr di vî partiyê

DEP'ê de nedît, ev parti wek partiya HEP ê heta ji HEP'ê jî kêmtir kopiya HEP'ê ye. Madem emê kopiye HEP'ê çêkin, wê gavê HEP heye çima em partiyekê weha çêdikin û min xwe paşve kişand.

Armanc: Di raya giştî ya Kurdan de temayek wilo heye, tê gotin Şerafetîn nebû serokê DEP'ê, ji bo vî jî DEP'ê veqetiya. Ger ku partiyekê din ji derveyê DEP'ê çêbe û bi dilê we be û hun wek serok nehên hilbijartin hûnê tê de kar bikin?

Elçî: Nûha mesele ne mesela ku ez bibim serok. Mesele ew e ji milletê Kurd re çî xêr e çî ne xêr e. Eger serokatiya min ji milletê Kurd re xêr e, lazîm e ez bibim serok. Eger serokatiya min nexêr e, hinek din ji min baştir bikaribin vî karî bimeşînin, ev insan kî dibe bila bibe li ser serê min

cihê wî heye. Di xizmeta wî de her dem hazir im. Lê wan tercîhê weha kir; kî zilamê me ye, kî ne zilamê me ye. Dema ev hilbijartin çêkîrin pîvana wan ne ew bû ku ka ev insan jî vî partiyê

Tercîha wan jî ne ew bû ku yên li hember min pênîyarê serokê partiyê kirin ji min çêtir e, layiqî vî karî dîtine ji min qencîr vî karî bimeşîne, na. Zilamek ji xwe re mutemed ku di bin emrê wan de be dîtî, di vir de jî tu menfeata gelê Kurd nîne

tiyê re baş e, bi vî wê kesî partî mezin bibe, ev partî bêtir kare dawa gelê Kurd bike, eger bi vî hawî hatiba hereket kirin, kî bibûna serok ne mesele bû.

Ev helwesta HEP'ê bû. Yanî bila partiya legal di bin emrê partiyekê îlegal de be, ji bo wê qerar carek din di destê partiyekê îlegal de be.

Serokî, mana wê ev bû ku, hemû kes dizanin ez ne di bin emrê tu rêxistinê de me. Ez bûbûma serok wê gelê Kurd jî bizanîbûna, hemû kes jî bizanîbiya, ev partî ne di bin emrê tu kesî de ye. Di bin seroktiya min de gelê Kurd menfeata xwe didît, ne mesela şexsî ye. Çunkî ihtiyaca min bi seroktiyê nîne. Ez ne ji wan mirovan im ku îllahî bibim serok. Lê bi serokatiya min ezê bibûma sebeb ku ev partî wê bibûya partiyekê serbixwe, wê îtîbara partiyê hebûna.

Yekî di bin emrê xwe da anîn

Partiyek legal heta di bin emrê partiyekê îlegal de be, wê tu îtîbara partiya legal tunebe. Tercîha wan jî ne

ew bû ku yên li hember min pênîyarê serokê partiyê kirin ji min çêtir e, layiqî vî karî dîtine ji min qencîr vî karî

bimeşîne, na. Zilamek ji xwe re mutemed ku di bin emrê wan de be dîtî, di vir de jî tu menfeata gelê Kurd nîne.

Armanc: Gelo we nizanîbû ku, piştî protokola PPK'ê û PSK'ê wê ev teref ji derveyê HEP'ê partiyek din çêkin û ev partî wê di paralêla vî protokolê de be?

Elçî: Ev tişt min nizanîbû, tiştêkî wilo jî di serê min de nebû. Tiştên wilo jî ez qebûl nakim. Yanî hersê partiyên ku bi hev re protokol îmze kiribûn û hemû partiyên îlegal jî bigên hevdu, bêjin emê partiyekê legal damezrînin, ezê dîsa tê de cî negrim. Eger sibê partiyen îlegal bi hev re cepheyekê çêkin û ev cephe bêje emê partiyekê legal çêkin, ezê di vî partiyê de jî cî nestînim.

◆

Xurtbûn destpêka serketinê ye

S. Bengîn

Van salên dawiyê, Kurd bûn şahid ka dijminên Kurda bi çi qewetên mezin û pir alî dikarin bêne ser Kurda. Ji bo ku şerê azadiya Kurda bi carekê vemirînin û di derheqa azadbûnê de bê hêvîbûnekê têxin nav Kurda, çi pêwîst bûye kirine. Ji bo ku çavên Kurda biûrsînin û xurtbûna dewletê dîyar bikin, pîr caran bi qewetên mezin çûne ser bûyeran û bi leşkerê giran zulm û xisarêtin mezin dane Kurda.

Xurtbûna dewletên dijmin di hêla çêk, leşker û pîr mecalên din de tiştekî eşkere ye. Lê di sa ji him di nav Kurda de, him di nav mîletên xwe de û him jî li dervayî welat ji bo ku piştigirîya xwe pirtir bikin bi şev û roj dixebitînin Loma jî di derheqê pîrsa Kurd de ev dewletên di nav çavê Kurda de ne, pir bi hesarî li hev dikin û di qada karên diplomasiyê de piştigirîya hev dikin. Ji ber ku baş dizanin ew çend gelek bin, piştigirî wan pirtir bin, karê wan jî wilo hesantir e û kar jî bo Kurda jî li wê gorê sexttir e. Ji bo ku Kurda, di doza azadiyê de neheq derxin û bê piştigirî bihêlin bi hezaran dek û dolaban digerrînin, wek gangsterên mafîya terorê dikin û dixin stûyê Kurda; û ger meriv li kirinên wan binêre wê di vî karî de salên ku bînan hîn xurttir bimeşînin. Di hêla diplomasiyê de jî qirik li xwe çirandin, solên xwe pê qetandin.

Li Tirkîyê rewş eşkeretir e. Şerê ku Tirkîyê bi hev re dikin li hindik welatên din dikare bê dîtin. Lê dema tenê ser pîrsa Kurda hemû gelê wan dibin yek deng û yek qewet û piştigirîya hukûmeta xwe dikin û ji aliyê din ji bona ku şerêkî baştir li dijî Kurda nakin rexne jî li wan dikin. Bêyî mesela Qibrîsê, di tu meselên din de wek ku di derheqa Kurda de dibin yek, nikarin tifaqekê di nav xwe de ava bikin. Ew hêvî dikin ku xurtbûna wan, dikare şikandina şerê azadiya Kurda mumkun bike.

Pêwîst e meriv bê hêvî nebe, lê bi rastî ger Kurd karibin ders ji bûyeran bigirin, bes ku Kurd tîra xwe bi aqil û şiyar bibin, tişt hatin serê wan. Eşkere ye bê dijmin çi şerê mezin, pir alî û dirêj li hember Kurda didomîne; û eşkere ye bê Kurd jî çi dixwazin: ji bo bîdestxistina daxwaza xwe çi bibe nebe wê li hember dijmin rawestin. Pêwîst e Kurd formula xwe ya emê çawa Kurdistanê azad bikin li gor wê pêvajoya ku wê bê jîyan ava bikin û dest bi kar bikin. Pêwîst e temamê şiyar û xwedî rûmetên Kurda berpirsiyarîyên pêşengîyê bigirin ser milên xwe û bikin ku Kurd ne li meydana ku dijmin amade dike bi dijmin re têkevin şer.

Ger xurtbûna dijmin kanbe bibe sedema şikandina şerê azadiya Kurda, xurtbûna Kurda bê guman destpêka serketina Kurda ye. Xurtbûn ne gelek bûn tenê ye, lê pir cara ger meriv ne gelekbe meriv ne xurt e jî. Pêwîst e em wilo xurt dest pê bikin ku dijmin li kuderê û bi çi awayî êrîş bike, em li wir karibin li hember rawestin û êrîşên dijmin pûç bikin. Rewşa iro û êrîşên dijmin yê pir alî vî riyê dide pêşîya Kurda. Şerê azadîkîma welatekî di dema îro de li gor bîst salê borî sed cara zahmettir e. Ger Kurd di hela kadrode bi hejmar û kapasîteyek mezin dest bi kar nekin, wê nikanbin rêxistinên pêşeng ava bikin

û imkanên pêwîst amade bikin û qewtên Kurda di her hêlê de mobilîze bikin, dijmin jî Kurdistanê derxin.

Dijmin ne bi leşker û tivinga tenê şer dike. Meriv di dema me de nikare bi çêk tenê welatekî bindest jî lepên dewletek xwedî hemî mecala rizgar bike. Pêwîst e meriv kanibe ne di hêla çekdarî tenê de, lê di hêla diplomasiyê, çapemenî, îdeolojî, îdarî û her tiştên din, kanibe şer bike û dijmin bişkîne. Serketinê çekdarî jî wê demê dikarin bibin serketinê nemir. Ji vî karî re jî beriya hemû tiştan kesên ku karibin kar bikin hebin. Pêwîst e her babet merovên bi rumet di vî karî de beşdar bibin û karên ku baş-tirîn dikarin bikin bigirin ser milê xwe, û li hêviya kesekî din nehêlin. Pêşengîya ku pêwîstiya Kurda îro pê heye, wilo dikare bê avakirin.

Bêguman şoreşgerî karekî ku meriv jî xwestina dilê xwe û bi bahwerî dike. Meriv

şoreşger yê bi serê xwe tenê jî nikare bike. Ji bo serketinê bi hêzbûn pêwîstiya ye. Lê çi mixabin gelek welatparêz û sosyalîstên ku bi rastî ji karê rexistinê re dikarin bibin kadroyên bingehîn, di mana pratîk de xwe li dervayî vî karî dihêlin û hew heqê xwe yê rexne

û gazina tenê bi kar tînin. Lê karên ku ji bo azadiya Kurda bêne kirin, wezîfa temamê însanên bi rûmet e. Pîr kar li benda ku wê rojekê hinek bînan bikin hene. Bi rexne û gazinan tenê tu hêz ne rast û ne jî xurt dibin.

Salên şêstî ji bo Kurdên Tirkîyê bi gelemperî destpêka fêrbûna karê rêxistinî û sosyalîzmê bû; salên heftîyê bûn salên şaş avakirina partiyên sosyalîst. Salên heştîyê jî şaş hatin dîtin. Şaşiya mezintirîn ew bû ku gelek partî û rêxistinên wek hev ku di detayê de jî hev cûda bûn, dihatin ava kirin. Slogana yekitiya îdeolojîk ku pir caran şaş dihat tercumekirin û bi mana ku ger meriv endamê partiyekê be, pêwîst e meriv tev weke hev bifikire û weke hev bêje; bîr û baweriyên xwe tev di derheqa her tiştên ku hene û diqewimin de biguhurîne û bike wek ên partiyê û tiştekî dervayî bîr û raya partiya xwe nikaribe bêje dihat famkirin. Ev xwestinek pir kevnar e û li dijî sirûştîya însanê e. Bi vî makamî Kurd nikaribûn li hev bicivin, û yekitiya ku pêwîst bû, pêk nedihat. Ev pêvajoya zarokî û mezinbûna tevgera Kurda bû. Para şaşiyan wê demê, li dervayî hêza mana pir kesan de heye.

Lê tevgera Kurda iro kamil bûye. Partiyên siyasî ku sala bûrî bi awayekî nû ji çend hêzên xwedî tecrûbên salên dirêj in avabûn, hêviyan mezintir didin meriv û rîya ku temamê welatparêzan karibin di nav de ciyê xwe bigirin û rola xwe bilîzin, vedikin. Ne pêwîst e di detayan de em tev weke hev bifikirin; lê di derheqa pîrensîbên bingehîn de bê guman emê li hev bikin û heta qonaxa rizgarkirina Kurdistanê pir karên ku meriv dikare bi hev re bike hene. Ger meriv bi vî si-loganê dest pê bike, rêya bi hev re karkirinê eşkeretir dibe.

Fermo, em tev bi hev re vî heqê xwe bîkar binin, wezîfên xwe bi cî binin.

Lê tevgera Kurda iro kamil bûye. Partiyên siyasî ku sala bûrî bi awayekî nû ji çend hêzên xwedî tecrûbên salên dirêj avabûn, hêviyan mezintir didin meriv û rîya ku temamê welatparêz karibin di nav de ciyê xwe bigirin û rola xwe bilîzin vedikin.

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

Serpêhatî-1

Ji destpêka Nîsanê heta destpêka Heziranê ez li Sûriyê bûm. Îcar carna ezê weha wexta ku keys lê were ez ê ji were behsa serpêhatiyên xwe yê Sûriyê bikim.

Pakêtek Marlboro

Du hefteyên me li Sûriyê neqediya, welweleyek ket nav xelkê, xelk û qaçaqxçiyên mezin li bin guhê hev ketin. Ew û hukmat bi hev ketin. Li dawiya dawiyê hukmat bi ser ket û cixare ji piyasê rabûn.

Ê min, ev nêzî bîst salan e ku ez cixarê dikişînim. Û ez tu carî jî bê cixare nemame. Îcar bi ser de li welatekî wek Sûriyê ku rehên esebiyeta mirovî her deqçe radibin ser piyan, ger cixare jî nebe divê mirov ya xwe yan jî hinekan bikuje.

Neyselê di wê tengasiyê de me hefteyekê bi tîtûna qaçax a ku ji serxetê dihat, îdare kir. Lê paşê ew jî bi dest me neket. A îcar nebû! Me çiqasî hewl da qet nebû, heta ruşwet û bertilê jî daxî pere nekir. Wele em mecbûr man me partî kirin dewreyê. Ji hevalan yekî telefonî partiya Hemdûnê Bajarî kir,

yek ji mekteb siyasî ya partiya Hemdûn hat ba me û bi dilekî şikestî got "ev du hefte ye ku ji tîrsa cixarê me civîna komîta merkezî çenekiriyê, çunkî em ditirsîn ku endamên me di civînê de bi hev kevin, cixare jî tuneye ku wan nerm bike, ji ber wê jî me civînên xwe avêtin piştî ku cixare derkeve piyasê". Lê camêr navê hevalekî partiya Şemdinê el-Fellehî da,

Heta roja ku ez ji Sûriyê vegeryam jî ji bo derman jî cixare li piyasê tunebûn.

Sedhezar kes nivîsên wî dixwînin

Mamoste ji teleba xwe re got:

- Aferim ji te re, welê xîya ye ku tu dê bibî nivîskareke pîr mezin, bi hezaran keswê nivîsên te bixwînin.

Piştî gelek salan herdu rastî hev tînin.

Telebe:

- Mamoste gotina te rast derket, nuha ne bi hezaran lê bi sedhezaran kes nivîsên min dixwînin.

Mamoste:

Baş e, tu çi dinivîsinî?

Telebe:

-Tebela dikanan!



Ku bav qebûl neke

Mamosteya jin ji telebeyekî xwe diqehere û bi hêrs jê re dibêje:

-Axxx, xwezîka ez hefteyekê dayika te bûma, min zanibû minê tu çawa terbiye bikira!

Telebe:

- Baş e, lê ku bavê min te qebûl neke?



ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

◆ Li gor metodên pîvana astronomîk cîhana (kaînat) me 14 mîlyar sal berê hatiye avakirin.

◆ Roj ji dinê 149 598 020 km dûr e. Lê ji ber ku dinya di forma elîpsê de ye ji rojê dûrbûn bi kêmasî 147 097 800 km û bi azamî jî 152 098 200 km. ye. Giraniya rojê 1,9889x10 (25) ton e û ji dinê 332 946,04 car girantir e.

◆ Okyanûsa herî mezin Okyanûsa Mezin e û firehiya (aqara) wê 166 241 000 km(2) ye û %45,9'ê behrên dinê ye û kûrahiya wê ya navendî 4188m. ye. Li Okyanûsa Mezin ciyê herî kûr ku hatiye tesbîtkirin 11 034 m. ye.

◆ Li gor teoriyekê, însanê modern ku bi

Homo Sapiens tê bi navkirin li Afrikayê peyda bûye û piştê jî li dinê belav bûye. Lê fosîlên ku li herêma Hubeyî li Çînê hatine dîtin beravajîya vî teoriyê ye. Arkeolog Lî Tianyua li Enstîtûya Hubeyî li Çînê bi tevî arkeolog Dennis Etler li Unîversîta Kaliforniyayê li Berheleyê du seriyên ku ji alî Lî Tianyua hatine dîtin, analîz kirine û gihîştine encameke cûda. Li gor wan seriyên ku hatine dîtin 350 000 sal kevn in û ji cinsê Homo erectus in û însanê modern jî vî cinsê tê.

◆ Giraniya mêjiyê însan di navbera 21 û 55 salî de digihîje 1424 gramê. Giraniya mêjiyê piştî 55 salan êdî kêmtir dibe û di 1395 gramî de radiweste.

◆ Şaraba herî kevn, 230 sal Berê Zayîna 'Îsa (BZÎ) jî hestiyek di kûrahiya behra Spî jî alî lîkolînerê behran Jacques Cousteau yê fransîz hatiye dîtin.

◆ Hejmara hestiyên însanekî 206 e. Di zaroktiyê de ev hejmar 300 e lê hin hestî di dema gihîştinê de bi hevûdu re dihelin û dibin yek.